




Mebûsekî me kuştin





Mehmet Sincar ji aliyê oewletê ve hate kuştin.

Mebûsê DEP'ê yê Mêrdînê Mehmet Sincar li Batmanê bi êrişeke kontr-gerîla hate qetilkirin. Ji rêvebirên DEP'ê Metîn Özdemîr, Mebûsê DEP'ê yê Batmanê Nizamettîn Togûç di vê êrişê de birîndar bûn. Metîn Özdemîr jî li nexweşxanê mir. Serokê Giştî yê DEPê Yaşar Kaya da xuyani kirin ku Serokwezîrê Tirkîyê Silêman Demirel bi xwe mebûs û rêvebirên DEP'ê ji bo kuştinê hedef nîşan dane.

Serokên, DEP'ê merasima dewletê ji bo Mehmet Sincar qebûl nekir. Dewletê jî nehîşt ku DEP cenazeyê mebûsê Kurd rake û hêzên dewletê êriş birin ser kesên ku ji bo merasima cenazeyê hatibûn Enqerê. Paşî dewletê bi xwe bi beşdariya polîsan cenaze bir Kiziltepe û veşart. Niha jî DEP amadekariyê dike ku cendekê Mehmet Sincar ji tirba wî derxîne û ji nû ve bi beşdariya gelê Kurd biveşêre.

Rûpel 8



Di çanda me de motîfa Şahmaranê

Kurdistan, hemû çand û toreya Mezopotamyayê di xwe de dide xuyan. Îroj em bandora vê çand û toreyê di ronahiya çanda Kurdistanê ya hemdem de dibînin. Her wekî bi hezaran motîfên kevnare û dewlemend gişt xwe pêşkêşî çand û toreya me dikin.

Rûpel 11



Roja 8'ê îlonê li Enqerê hêzên dewletê êrişî ser welatparêz, mebûs û rêvebirên DEP'ê kirin û gelek mirov birîndan bûn. Mebûsên DEP'ê li hember vê hovîtiyê piir hêrs bûn

Rojek ji rojên girtîgehê

Rojek ji rojên payîzê bû. Şênkahiya ser Bircên Belek bi germa tava havînê, ji xweşikbûna xwe dûr ketibûn. Bûk û zavayên di nav şênkahiye bere bere serê xwe wek şagirdê ku, serê xwe birêz li ber mamostayê xwe xwar dikir bi wî xaydeyî wan ji serê xwe li ber...

Rûpel 13

Nûçeyên cengê

Navenda Nûçeyan-3 İlon 1993:

Geñlayên ARGK'ê avêtin ser qereqola Amutka ku, di navbera navçeyên Pîlûr û Xozada Dêrsimê de ye, du serbaz û çawişk hatin kuştin. Ji geñra kuştî nîn e.

Li Hezoya Batmanê geñla bi roketavêjan êrişî avahiya dewletê kirin. Di vê êrişê de lojmanên polîsan, mudiriya emniyetê, avahiya PTT'ê û wargeha hikûmetê xesirandin.

Hêzên dewletê li hawîrdorê çiyayê Cûdî operasyoneke dorfireh pêk anîn. Li gor nûçeyên ajansa KURD-HA'yê gelek car hêzên dewletê û geñla rastî hev hatine, di şerê navbera herdu hêzan de 3 leşker, 2 cerdevan û geñla-yekek hatine kuştin. Di kemîna geñla de 2 erebeyên leşkerî şewitîn, helikopterek xesirî û ji mecbûrî xwe danî.

Bi fermana Qumandariya Eyaleta Serhedê, geñlayên ARGK'ê li hin deverên Herêma Serhedê wek Îdirê, naşnameyên gundiyan dicivînin û dişewitînin.

4 İlon 1993:

Serbazek li Elbana (Başka- le) Wanê di kemîna geñla de hate kuştin. Li Cûlemêrgê, geñla ji navçeya Geverê 11 cerdevan revandin. Geñlayên ARGK'ê li Mûşê cerdî ser Qereqola Korkutê kirin û girîgehê ji xesirandin..

5 İlon 1993:

Li Nisêbînê panzereke tîman bi cerda geñlayan îmha bû. Di bûyerê de 4 tîm hatin kuştin. Li Bongilan (Solhan) a Çepeqçûrê di nijdeya geñla ya ser qereqolê de leşkerek

mir, 3 heb ji birîndar bûn.

Li Ruhayê, li navçeya Wêranşarê di nav hêzên dewletê û ARGK'ê de şerek qewimî. Li hêla gundê Kewirbêr 3 geñla bi navên xwe Mehmet Duman (Dawid, Wêranşar), Emîn Erdal (Pala, Kercews), Serxwebûn (Ji Dikê, Qoser) hatin kuştin.

Li gundê Aşkulê ku li ser Agiriyê ye, geñla êriş bir ser stasyona TRT'ê û qereqola cendirmeyan. Li navçeya Gêlê (Egil) ku li ser Amedê ye, geñlayan nasnameyên nêzikî 100 kesî ji wan standin û nedan wan. Di bûyerê de qamyoneke YSE'yê ji şewitandin.

6 İlon 1993:

Li Ruhayê geñla bi mebesta ku kontrgeñla li Batmanê cinayetan pêk tîne, avête ser wargeheke bêhnvedanê û 3 kesên kuştin. Li Sasonê geñla avête ser Qereqola Acarê, 6 meterîsên (mewzî) cendirmeyan bi hewayê xistin. Di bûyerê de leşkerek hate kuştin. Li ser vê yekê hêzên dewletê gundê Herendê dan ber gulleyan. Geñla ji Şirnex û Cûlemêrgê 7 cerdevan revandin.

Li gor nûçeyên KURD HA'yê operasyona dewletê ku, ev heftiyek e li Gebarê dest pê kiribû, qediya. Di vê operasyonê de ji geñla 5 leşker, 4 cerdevan kuştin, 7 cerdevan dev ji vî karî berdand. Geñla bi cerdên qereqolan gelek cebilxane bi dest xistiye.

8 İlon 1993:

Di şerê navbera geñla û hêzên dewletê de ku, li nav Elaşgira (Eleşkirt) Agiriyê û Qaqizmana Qersê pêk hat, 5

geñla hatin kuştin, 20 leşker birîndar bûn.


Geñla li navçeya Pêrtax (Pertek)'ê ku li ser Dêrsimê ye, karistana nex (ben) şewitandin û midur û notirvanê(bekçî] wê kuştin. Li gofî ku tê gotin ev karistan piştî 12'ê İlonê ji bo cihê işkenceyê hatiye bikaranîn.

Gundê Şax û Hebler ku li ser Şirnexê ne, di binabloqeya hêzên dewletê de ne. Çûnûhatina van gundan hatiye qedexekirin. Geñlayên ARGK'ê dibistana gundê Koleyê ku li ser Tatosâ (Tekman) Êrziromê ye şewitandin.

Ji 2 gundên Elbakê 9 cerdevan hatin revandin, bûyer ji aliyê ARGK'ê ve pêk hat. Geñla li Wanê girtin ser maleke cerdevanan, cerdevanek bi navê Fahit Urğan hate kuştin. Tîmên Taybetî li Cûlemêrgê cerdî ser maleke ji gundê Dura ku, li ser Geverê ye kir. Bi navê Sabrî Bardakçî zilamekî kuştin. Li Motkaya Bîlîşê di şer de geñlayek û 2 leşker hatin kuştin.

10 İlon 1993:

Hêzên dewletê Herendê bi gulleyan kutan. Berî du rojan geñlayên ARGK'ê êrişî Qereqola Herendê kiribûn û ew xesirandibûn. Li ser vî awayî hêzên dewletê girtin ser gund û gundiyekek kuştin, 4 gundî ji birîndar kirin. Herendê gundê Hezoya Batmanê ye. Li hêla Mêrdînê ji hêzên dewletê, gundiyeke gundê Sebjor û Kanîalî ku, li ser navçeya Şemrêxê ya Mêrdînê ye li qada gund civandin û li wan işkence kirin. Di vê bûyerê de zarokêkî 10 salî ji ber işkenceyê bi xedarî birîndar bû.



Mehmet Sincar, Habîb Kiliç û Metîn Özdemîr di riya welatekî serbixwe û azadiya gelê Kurd de şehîd ketin. Hêzên dewleta Tirk bi xwe ew qetil kirin. Şehîdên me her tim wê di dilê me de bijîn û heyfa şehîdan li erdê namîne. Êşa malbata wan êşa me ye jî. Serê gelê me sax be.

Xebatkarên rojnameya Welat

HAWAR

Dilbixwîn

Nikaribûn 'Bijî Serok Apo' qedexe bikin

Hîna gelê me westa nebûye, naweste jî. Biryakere wisa daye dîrokê: "Heya ku em taca serxwebûnê nedin serê xwe û weke însanên layiqî azadiyê xwe bi dinyayê nedin pejirandin, em westa nabin, em ranawestin, namirin jî. Belê, an wê di nava welatên cihanê de Kurdistanê hebe an jî emê kesekî rehet nehêlin. An wê destê xwe ji Kurdistanê vekîşînin, an jî emê tevayî dinyayê bi xwe ve mijûl bikin..." Vê carê jî Kurd dixwazin wiha derbasî nava dîrokê bibin.

Heyecan û germahiya li Bonnê sar nebûye. Şopên lîngan li cihên xwe rêç hiştine, rêwiyan serî li Bonnê bidin, bêguman an wê bibihîzin an jî wê bibînin ku, 120. 000 Kurd di bin siha alên xwe yên neteweyî de, mil dane hev piştê hev girtin, deng û dilê xwe kirin yek û ber bi azadiyê ve meşîyan. Dîrok û hilpişkînen wisa berz û bilind ji bir nake. Rastî hebin derew di bin de tene veşartin.

Piştî Bonnê em di 4'ê İlonê de berê kerwanê xwe didin Frankfurtê. Vê carê em li Frankfurtê hev dibînin. Di dîrokê de civînen wiha mezin ku, 120. 000 kes beşdarî wê bibe tune ne, weke ku em biçin tevî kongreya Kurdistanê ye neteweyî bibin, em bi wî giyanî çûne Frankfurtê.

Em diçin sozê xwe bidin şehîd, Serokatiya Partiyê û gelê Kurdistanê. Em diçin soza girêdana bi dozê ve bidin. Diçin li Serokê xwe guhdarî bikin. Ma mafê min nîn e? Ez bibêjim bila dinya ji me hîn bibe çawa gel Serokê xwe diparêze. Ji mirovahiyê re dersên wiha pêwistin.

Bila hîn bibe çawa yekîti tê afirandin.... Çawa gel dibe PKK û PKK dibe gel.

El bete "Bijî Serok Apo" di dilê gel de ye, biryarên dewletan nikarin tu caran qedexe bikin. **Û dema ku sloganên ji bo şoresê dihatine avêtin dinya dihejiya. Eger evqas kes li bajar û welatekî biyanî xwe digihînin hev û banga azadiyê bilind dikin, vê carê sedem çî ye ku kesek naxwaze li dengê wan guhdarî bike? Çîma ji bo Kurdan tenê azadîxwazî terorîzm e?**

Ez nizamim çî bibêjim, biborînin belkî di nava vê nivîsa min de ken û girî tevî hev bibe. Çîma ken, çîm girî?

Ev dinya ji me çî dixwaze? Tu jiyana ku me gihan dibe mirovahiyê heye? Her kes dizane me çiqasî ji mirovahiyê re xizmet kiriye, dîrok şahid e.

Her roj însanên me dikujin kesek napirse ev mirovên bêgûneh çîma tene kuştin? Kî wan dike...? Xwestin rê li pêşiya me bigirin mehkeme vekirin gotin: "Ev festîvaleke polîtîk e, PKK li piştê heye, em destûrê nadin di afîşên wê de wênayê A. Ocalan heye..." Carekê gotin: "Pankartên ku navê PKK'ê li serê hebin wê neyêne daleqandin..." Careke din berî festîvalê dest pê bike polîsan ev mesaj anîn. Sloganên "Bijî PKK", "Bijî Serok Apo" neavêjin.

Elbete "Bijî Serok Apo" di dilê gel de ye, biryarên dewletan nikarin tu caran qedexe bikin. **Û dema ku sloganên ji bo şoresê dihatine avêtin dinya dihejiya. Eger evqas kes li bajar û welatekî biyanî xwe digihînin hev û banga azadiyê bilind dikin, vê carê sedem çî ye ku kesek naxwaze li dengê wan guhdarî bike? Çîma ji bo Kurdan tenê azadîxwazî terorîzm e?**

Min ev tişt ji festîvala Kurdistanê ya 2'an fêhm kir. Yekemîn: Rê li pêşiya mirinê hatiye girtin û ji jiyaneke serbixwe re hemû tişt pêşkêş dibe.

Duyemîn: Zor, zora zorê dibel! Bi zorê em xistine bin destên xwe, emê bi zorê rizgar bibin.

Sêyemîn: An wê dinya riya jiyane li pêşiya me veke, an jî emê nehêlin kesek li ser rûyê vê zemînê rihet jiyana bibe.

Çaremîn: Belkî di ferhenga împeryalist û kapitalîstan de PKK weke rêxistineke terorîst were naskirin, lê di ferhenga 40 milyon Kurd de PKK rêxistineke serxwebûn û meşa azadiyê ye. Serok Apo, serokê neteweyekî ye, meşa gel û ji bo gel e. Li vir ez dipirsim: "Êdî wê serê dinyayê li diwaran nekeve? Wê hişyar nebe û nebêje jî Kurdan re azadî?"

RRF û Îsraîl li hev tîn

Nûçeyên Derve- Li gor beyana Dîrektore Wezaretê Karên Derve yê Îsraîl General Urî Savîr, Îsraîl û Rêxistina Rizgarkirina Filistinê ji bo hevnasîne roja 9'ê Ilonê li Parîsê gihîştin encameke erênîyê.

General Savîr ji Ajansa Reutersê re got ku, piştî lihevrûniştinekê bi rayedarên Filistinê re gihîştine encamalihevîkirinê. Lê rayedarên Filistinê nehatin binavkirin.

Balyozê Îsraîl Yehuda Lankrî daxuyand ku, li ser pirs-girêkên bingehîn wek "dev ji terorê berdan û guhertina Bernameya Neteweyî ya Filistinê" encam hatiye standin.

Weke tê zanîn, berî bi çend rojan Arafat li ser vî pirs-girêkê wiha gotibû: "Divê ev tişt bi destê Meclîsa Neteweyî ya Filistinê çêbibe".

Li gor çavkaniyan, bel-

● *Bi pêşengiya Yaser Arafat, RRF bi îsraîl re ji bo hevnasîne li ser masê rûnişt. Li ser vî nêzikahiya Arafat ya ber bi Îsraîl ve ji aliyê grûbên radikal ên di nav RRF'ê de hate rexnekirin.*

geyên lihevîkirinê ji bo kontrola Yaser Arafat, bi rê bûne Tunus'ê.

Balyozê dewleta Îsraîl Lankrî beyan kir ku, kesê ku bi heyeta Îsraîl re rûniştiye, Serokê Karên Aborî yê RRF'ê Ebû Ala ye.

Li aliyê din Serokwezîrê Îsraîl beyanek da û daxuyand ku, dê Arafat Întifadayê bide rawestandî. Îzak Rabin bi danezanekê bang li Arafat kir ku, vegere cihê dagirkirî û ji gelê Filistinê re dema nû beyan bike ku, ev dem dema lihevîkirinê, avakirinê, hevkarîyê û li hember teror û êrîş-baziyê rabûn e.

Li dijî vî atmosfera lihevîkirinê, reaksiyonên hêzên Filis-

tînî yê radikal jî didomin. Serokê Eniya Rizgariya Gelê Filistinê George Habas, di hevpeyva xwe ya bi Özgür Gündemê re de wiha dibêje: "Pilana Gazze-Erîxayê daxwaza gelê me ya çarenûsiyê nayîne cih. Lewre, emê ji bo serxwebûn û azadiyê eniyeke nû ava bikin. Dê hemû hêzên rizgariyxwaz (ên îslamî jî tê de) bikevin nav refên vî eniyê."

Di vî navê de, 200 mirov kesên ku, Îsraîl nefî kiribûn û di herêma bêînsan ya di navbera Îsraîl û Lubnanê de bi cih bûbûn, di bin çavdêriya hêzên Îsraîlî de vegeriyan Îsraîlê. Dê ev kes bêne darizandin û yê li gor qanûnên Îsraîlî sêdar bêne cezakirin.



(Ji rojnameya Libêration)

Serlêdana Çillerê ya Moskovayê

Serokwezîra Kormara Tirk Tansu Çiller li ser vexwendina Serokwezîrê Rusyayê Victor Chernomyrdin, roja 8'ê Ilonê çû Moskovayê.

Serdestên dewleta Tirk, ji vî serlêdane encamên gelek baş dipên û wek keysekê dinirxînin. Çiller bi hêviyê mezîn çû Moskovayê, bes tiştên bi dest bixîne zehf kêmtir in. Ji ber ku, nakokiyên di navbera herdu dewletan de ne ewqas bi hêsaniyê nayên çareser kirin. Tiştê herî girîng ku, dê li serê guftûgo çêbibe, nakokiyên di navbera dewletên li Qafqasyayê de, nemaze yê Azerî û Ermenîyan e. Di vî mijarê de ji bo wan dewletan bixin bin bandora xwe, di navbera Rusya û Tirkîyeyê de pêşbaziyek heye.

Niha Rusya bandora xwe li ser wan dewletan xurt dike, li aliyê din bandora Tirkîyeyê qels dibe.

Berî hevdiştinên bi rayedarên Rusyayê re, serokwezîr bi Serokê Azerbeycanê Haydar Aliyev re jî hevdiştinek çêkir.

Wek tê zanîn Haydar Aliyev, piştî dîrketina Elçîbey hate ser kar û bi hatina wî jî têkiliyên Azerbeycanê bi Tirkîyeyê re qut bûn. Niha jî dixwaze bi Rusyayê re têkiliyên xurt deyne û têkeve nav refên "Civata Dewletên Serbixwe." Aliyev li ser têkiliyên bi



Yeltsin û Çiller li nîk hev ji bo çapemeniyê pozên xweşik dan, le pirs-girêkên ku li ser mijul bin ne ewqas xweşik in.

Tirkîyeyê re ji nûçevanê "32. Günê" re wiha got: "Em naxwazin Tirkîyeyê têkilî karên me yê hundirîn bibe."

Nakokiyên di navbera wan dewletan de ye, li ser petrola Azerîyan e. Ji ber ku Rusya naxweze petrola Azerîyan di nav sînorên KT'ê re derbas be û bigihîje bazara dinyayê, ji alî ten-

gavê ve Tirkîyeyê jî astengiya derdixe pêşberî Rusyayê. Di vî mijarê de şerê gerîla xetereyekê mezin e, li pêşberî Tirkîyeyê. Ji ber ku, ev xeta boriyê divê di nava Kurdistanê re derbas be. Çiller dixwaze bi vî serlêdanê bi Azerbeycan û Rusyayê re li hevki-rineke nû çêbibe.

Li Belçîkayê bûyerên nîjadperest

Nûçeyên derve- Xwepêşandan, bûyerên nîjadperest û şovenîst li herêmên Flaman roj bi roj zêde dibin.

Ji çend hefteyan vir ve, bûyerên nîjadperest ên ku li hin deverên Belçîkayê digewimin, di van rojên dawî de zêde bûn. Roja 2'yê Ilonê, li bajarê Saint Nicolas, serrûtên Belçîkî, di dawiya konserekê de êrîş ser 200 kesên biyanî yê penaber kirin. Li ser vî yekê polîs, 41 serrût ji bo pirsîyariyê girtin û derxistin derveyî bajêr.

Di eynî rojê de li bajarê Renaix, alîgirên partiya rast a radikal Vlaams Blok bûn sebebê hin bûyeran. Alîgir û mîltanên Partiya Vlaams Blok, bi pêşengiya mebûsê vî partiyê Philip Dewinter ve li dijî derfetên ku, ji Frankofonan re tîne temînîkirin û li dijî pena-

berên siyasî xwepêşandanên protestokirinê li dar xistin.

Neo Nazîstên Flaman jî, li hember vekirina avahiya penaberan xwepêşandanek li dar xistin. Di dema xwepêşandanê de Neo Nazîst cerdî ser xebatkarên televîzyona ZDF'ê kirin.

Ji ZDF'ê 2 xebatkarên ku dixwestin van bûyeran bikişînin, li ber çavên mebûsê Partiya Vlaams Blok Philip Dewinter, ji aliyê mîltanên nîjadperest ve hatin kutan.

Yek ji wan xebatkarên, piştî bûyerê wiha got: "Nîjadperestan êrîş ser me kirin, hacetên me şikandin, hem jî li ber çavê mebûs Philip Dewinter".

Êrîşên nîjadperest ên bi vî rengî hê jî li hin deveran berdewam dibin.

Li Somaliyê 7 leşkerên Nîjerî kuştin

Nûçeyên Derve- Li Mogadişuyê, roja 5'ê Ilonê 7 leşkerên Nîjerî yê ji 'Hêzên Aştîyê' ji aliyê piştgirên Mihemed Farah Aîdîd ve bi êrîşeke çekdar hatin kuştin. Li gor agahiyên ku ji herêmê gihîştine ajansan, li cihê bûyerê lihevîxistin çêbûye û 15 kes ji Somaliyan birîndar bûne, 2 kesên birîndar jî hatine girtin. Piştî bûyerê, leşkerên Nîjerî bi erebeyê dewriyeyê digerin û alîgirên Aîdîd pêşî li wan digirin û wan didin ber gulleyan. Di vî bûyerê de 7 leşkerên Nîjerî tene kuştin. Ji aliyê NY'ê ve, li ser vî bûyerê tu daxuyanî nehatin kirin. Ev êrîşa duyemîn a mezin e ku, alîgirên Aîdîd, li hember "Hêzên Aştîyê" pêk tinin. Di êrîşa yekemîn de jî 23 leşkerên Pakîstanî hatibûne kuştin.

'Min negotiye PKK terorîst e'

Nûçeyên Derve- Wezîrê Karên Derve yê Almanyayê Klaus Kinkel, roja 7'ê Ilonê di civîneke ji bo çapemeniyê de daxuyand ku, tu car negotiye, "PKK terorîst e". Lê daxwaza wan a ji bo qedexekirina PKK'ê didome. Kinkel daxuyand ku, li ser vî mijarê bi Wezîrê Karên Hundirîn re bi hev dişewirin û ji ber gelemşeyên qanûnî, zêde tişt bi dest nexistine.

Dîsa Kinkel got ku, ew li ser erdên Almanyayê, di navbera Kurd û Tirkan de şer naxwaze.

Li gorî daxuyaniya Kinkel, li ser hewldanên ji bo qedexekirina PKK'ê, ji aliyê vî rêxistinê ve hatiye tehdîtîkirin. Li ser pîrsa rojnamevanan, Kinkel di bersiva xwe de diyar kir ku, Almanyayê dewletekî hiqûqê ye û ji bo girtina Berdevkê ERNK'ê Alî Sapan û kesên weke wî siyasî, tu sebeb nîn e.

Rewşiy Dîmukrasî le Kurdistanîy Başûr

Başûrê Kurdistan/ Welat—Sereray ew bare abûriye nalebarey ke emro geliy ême le Kurdistanîy Başûr tiyayda deji, sereray ew talan û diziyey le paş serheldaniy adariy 1991 ewe destiy pê Kirdûwe u hêsta berdewame, sereray ewey PDK u YNK destiyan be ser hemû rûwêkiy jiyaniy abûrî û komelayetiye û siyasî degirtûwe û hiç dewrêkiyan bo hiç komel û mirovêkiy tir nehêstotewe û berdewamiş zurnay azadî û dîmukrasî dejenin û be nawiş gel û têkray cemawerewe qise deken bilam ew kesey serdaniy Kurdistanîy Başûr bikat barêkiy pêçewaney jiyaniy azadî u dîmukrasî debîne betaybetîş ke le behar û hawîniy em salewe helmetiy reşekujî destiy pê kirdûwe. Em helmete miroviy şorişgêr û welatparêziy girtoewe.

Rewîf Kamîl Akreyî Serokiye Têkoşaniy Rencderaniy Kurdistan le şariy Dihok be destêkiy nadiyar hate kuştin.

Yusif Şabî Endamiy Serokayetiye Bizûtinewey Aşuriy û Endamê Parlemanîy Kurdis-

tan kujra. Abu Nesîr Endamiy Komîtey Nawendiye Partiy Komonistiy Êraq, Renas, Endamiy Komîtey Nawendiye Hizbiye Zehmetkêşaniy Kurdistan, Hakim Tehsîn, dadwariy Zaxo, Nezîr Umer Endamiy Partiy Komonistiy Krêkariy Êraq le Zaxo hatin kuştin. Paşiy ewan melayekiye Kurdperwer û niştimanperwer be nawiş Melâ Abdulrehman Hemzekerî le Hawier be demançey bedeng kujra. Herweha ronamey Wulat le layenparhezgariy Hewlêr ewedaxra. Hemû ew rûdawane pêçewaney rêsa û nerîtiy dîmukrasî. Geliy Kurd le Kurdistanîy Başûr sî sale le şorişkiy berdewam daye le pênav serbexoyî û dîmukrasî, lem rêgayed qurbanîyekiy bê ejmariy dawê u emroş her le pênav em awataney da astengiye u dijarî deçêjê. Be dirêjayî ew mawê dîr û dirêje û heta êsta serokayetiye Kurd cigê le amanciye teskiye kesayetiye u partayetiye çî amancêkiy tiriye leber çaw negirtuwe.

Emro geliy Kurd le Kurdistanîy Başûr baş ew rastiye dezanê Kewa serokayetiye Berye



Le Başuriy Kurdistan rewşiy siyasî û aboriy zor dêjwar e.

Kurdistanîy sê saliy tewawe Kurdistan talan deka û deybate derewe deyfoşê, ew yarmetiye û barbuwey le derewera bo Kurd dêt nagate gel bigre her be rêgawe deçete girfaniy çend kesêkewe. Hemû riwêkiy jiyaniy siyasî hu abûrî

û komelayetiye pawan kirawin bo kesk û zerd. Weray emeş serokayetiye Kurd berdewam amadeye be fitiy Turkiya şeriye bizutinewey Kurdistanî Bakur bikat. Berdewam bûniye em jiyane le Kurdistanîy Başûr biwete mayey bilawbûnawey bê

baweriyeke gewre le naw têkray gelda. Siyasetiy serokayetiye Kurd le başûr rêge xoşkeriy hatnewey rêjîmiy Saddam Husen e bo Kurdistan, ew şitey geliy Kurd le hiç cêgeyekiye Kurdistanî nayxwazê.

Berpisîyarê Newroz'ê bernedan

Navenda Nûçeyan—Daxwaza tehliyekirina Berpisîyarê Nivîsaran ê kovara Newroz ê Adil Kurt hate redkirin. Adil Kurt ev 2 meh in ji ber 14 nivîsên ku, di hejmara 18'an ya Newroz ê de hatibûne weşandin, girtî ye. Daweya Adil Kurt li DGM'ê (Dadgeha Ewlekariya Dewletê) ya 3'ê yemîn didome û ji aliye dadgehê ve tê xwestin ku weşana kovara Newroz ê bê rawestandî. Sedem jî "bi riya çapemeniyê propagandaya cudaxwaziyê" tê nîşandan. Adil Kurt, îdîayên dadgehê red kirin û di metna parêziya xwe de ku ji 3 rûpelan amadekirî bû ev daxwaza dadgehê, bi bêmafî û bêhiqûqî sîwîdar kir.

Evûqatê Adil Kurt, Ercan Kanar û Türkan Kurtyılmaz diyar kirin ku, ev 5 meh in pesta li hember çapemeniya sosyalîst zêde dibe û divê bi lezgîniyê Adil Kurt bê berdan. Dadgehê tehliyekirina Adil Kurt red û daweyê taloq kir.

Berpisîyarê Rêxistina Hizbullah ê Wanê:

'Dewlet dixwaze berê me bide hev'

Navenda Nûçeyan—Berpisîyarê Hizbullah ê yê Wanê daxuyandî ku tu eleqe ya wan bi kuştina Mehmet Sîncar ve tune, ev karê artêşa Tirk a taybetî ye. Rojnameya Aydinlik'ê li Wanê bi serekekî rêxistina Hizbullah A. N re der heqê kuştina Mebûsê Mardînê Mehmet Sîncar de hevpeyvin kir. Ev çend roj in hinek rojname şêhdikirina Mebûsê Mardînê Mehmet Sîncar diavêjine ser rêxistina Hizbullah ê. Ev bûyer di televizyona de jî derket. Li ser vê bûyerê rojnameya Aydinlik'ê li Wanê bi serekekî Hizbullahê re têkilî danî û der heqê bûyerê de jê agahî stand.

Li gorî A. N şerrawestina di navbera PKK û Hizbullahê de, didome. A.N li ser

şerrawestînê wiha dibêje: "PKK û Hizbullah a Îraqê di navbera xwe de protokolek çêkiribûn, li gorî wê protokole me jî şerrawestîn xwest û em jî li pey vê protokole çûn. Tu sedemek jî bo xerabûna protokola ku di navbera PKK û Hizbullahê de hatiye kirin tune."

A.N dibêje: "Em vê şerrawestînê jî bo xweşiya Kurdistanê girîng dibînin, lê ku PKK vê şerrawestînê xera bike ew dizane. Me bi PKK'ê re li ser, li hember hev çek bikaranînê û têkilnebûna rêxistinên hevûdin protokolek îmza kir."

Rast e ku Hizbullah li hember PKK'ê bi dewletê re piştgirî kirye. Lê ew demên me bi dewletê re hevalbendî kiribû, di wan deman de kesên ku li dû me dihatin

gişt çûn ba PKK'ê û gelê me jî me qetiya. Piştî vê rewşê li bakurê Îraqê (başûrê Kurdistanê) di navbera lêzimekî Berzanî, Ethem Berzanî û PKK'ê de protokol hate îmzakirin, li ser vê bûyerê me jî li gelek cihên Kurdistanê belavok belav kir û şerrawestina di navbera PKK'ê û Hizbullahê de ku hatibû kirin da beyankirin.

KT (TC) jî vê protokole pîr qehirî, jî bo xerakirina protokole jî destê wê çî hat kir. KT jî PKK mirovan dikuje diavêje stûyê Hizbullahê, jî Hizbullah mirovan dikuje diavêje stûyên PKK'ê. Ew cihên ku rêxistinên me lê xurt in, KT êrişan dibê ser wir, mînak:

Li Batmanê gelek Hizbullahî kuştin."

Greva YJWK'ê didome

Navenda Nûçeyan—Greva birçibûnê ya YJWK'ê ku, di 23'yê Tebaxê de bi beşdariya 200 jinên welatparêz li bajarê Koln'ê (Almanya) dest pê kiribû didome.

Roja 8'ê Îlonê jinên welatparêz, di gel heyeteke jinên Alman ku nû ji Kurdistanê vegeyabûn, li ber Dêra Domê jî bo çapemeniyê civînek li dar xistin. Di vê civînê de Berdevka Greve Xanê daxuyand ku, dê Serokwezîra Tirkîyeyê Tansu Çiller, di gešta wê ya Almanya de protesto bikin, ji ber ku ew nûnerê şerê qirêjî ye û dixwaze bi vê gešta xwe jî bo meşandina şer aylîkariyê berhev bike. Xanê beyana xwe wiha domand: "Divê

Greva birçibûnê ya YJWK'ê ku, di 23'yê Tebaxê de bi beşdariya 200 jinên welatparêz li bajarê Koln'ê (Almanya) dest pê kiribû didome.

mirovên welatparêz, mirovhez û demokrat rê nedin vê yekê".

Di eynî civînê de ev vegotin jî çêbûn: "Heta daxwazên me neyên cih, em dev ji grevê bernadin. Armanca me li Ewropayê li dijî şerê qirêjî ku, dewleta Tirk dimeşîne agahdarkirin û birêxistinîkirin e. Em dixwazin li Ewropayê raya giştî li hember bikaranîna çekên kîmyewî, cinayetên kontrayan, pest û pêkutiyên hov ên li ser jinên Kurd bêdeng nemîne, heyetan bişîne Kurdistanê û li hember şerê qirêjî derkevin".

Di civînê de endamên heyeta ku, ji Kurdistanê vegeyabûn jî, çavdêrî û dîtinên xwe anîn ziman.



Dema mirin heye ez tune me.
Ku ez heme mirin tune.

EPIKROS

Paqijkara civakê: Çapemeniya Tirk

Ji aliyekî ve bila mebûsê Kurd ji hêla kesên ji me ve diyar ve bê kuştin, li hêla din jî bila polisên dewleta Bavoyê Sermezî li gelê Kurd zilma xwe, tehdeyên xwe bidomînin. Nehêlin kesên ku bixwazin beşdarê merasîma cenazeyê Mehmet Sincar bin, herin paytexta Ata.

Di vê navê de çapemeniya holdîngan bêrawestan ji bo civakeke paqij dixebite! Xewa şevan li xwe diherimînin. Pêşî serokê İSKİ'yê (İdareya Kanalizasyon û avê ya Stenbolê) ji ber bertîlxwarinê avêtin zîndanê. Camêro gelek xweş vî karî ji xwe re dikir. Lê Xwedê mala çavnebaran bi ser wan de bîne xwarê, pihîn li nanê wî dan. Cotikên wî qilopanî kirin.

Çapemenî vala namîne. Çima bisekine? Ma ne piyê demokrasiyê ya çaremîn e? Madem wisan e, dikare ji bo "civakeke paqij" hemû fedekariyan bike. Tew divê karibe xwe bi gorî jî bike. Wezîfe pîroz e.

Ma li dinyayê gelek mînak tune ne ku, dema çapemenî bixwaze, dikare çiyayên herî mezin ji cihên wan bileqîne, na na dikare wezîr, serokwezîr, serokkomar, peywîrdarên dewletê, karmend, burokrat hema çî were bîra we, wan

serserkî berî erdê bide.

Li Tirkiyeyê jî çapemeniya holdîngan û rojnamevanên "Mehmetçik" ên sondxwarî, carekê biryara xwe dabûn. Dê civakê ji çepelan, geniyân, ji kesên kirêt paqij bikirana. Xwedê jî li pişt wan e. Ma ku ne wisa be, ji wan re li hev tê?

Vê carê "paqijkarên civakê" li kirinên Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçioğlu rast hatin. Walî qet şerm û fedî nekiriye ji heft bavên xwe, pereyên ku ji Kurdên Başûr re hatibûn, xwariye. Nete-weyên Yekbûyî, ji bo alîkariyê ji Kurdên ku ji ber zilma Sedam reviyabûn û hatibûn bakurê Kurdistanê, pere şandibû. Waliyê wê demê, yê "Herêma Taybetî" Hayrî Kozakçioğlu dema tayîni bajarê Stenbolê dibe, 2 milyar pere li ser navê xwe li bankayên Stenbolê dide razandin. Ev sê sal bi şûn ve dertê ronahiyê.

Dibêjin qaşo Ünal Erkan Waliyê "Herêma Taybetî" û Midûrê Giştî yê Emniyetê Mehmet Ağar li Kozakçioğlu gilî kirine. Ji ber ku Ünal Erkan çav berdaye cihê wî, der heqê wî de dosyayek hazir kirine û dane çapemeniyê.

Na, ev neheqiyê mezin e ku, li çapemeniya holdîngan

tê kirin. Ji ber ku biryara xwe daye, dê civakê ji kesên çepel pak û paqij bikin, wan nebiyan lê dikan. Dê gelek çepel derkevin. Carekê paqijkaran qerarê xwe dane. Dê bi ser wan kesan ve herin û gelek bûyerên bi vî rengî derkevin. Bila kes qet şik û gumanê ji wan neke.

Min li jorê jî got. Yezdanê dilovan jî piştvanê wan e. Di nav gel de baweriyek heye: "Xwedê li wê dinyayê heqan safî dike". Herê bi Xwedê rast e. Li vî dinyaya derewîn her tişt hel dibin. Ji roja qiyametê re tiştêk namîne.

Çapemeniyê, kirinên Kozakçioğlu derxiste holê. Nehîşt mirad bi pereyên Kurdan bike. Pereyên Kurdan ji ber ku, ji Kurdan re hatibû şandin. Çapemeniya "Mehmetçik" heyfa me Kurdan ji Hayrîko distîne, wî pereyî di pozê wî de tînin.

Hêdî hêdî gumana min namîne. Dê çapemenî dest biavêje şerê qirêjî yê li Kurdistanê jî. Çepeliya leşkeran jî paqij bike. Ji ber ku ew paqijkarên civakê ne! Ma dengê wan nayê we, rahiştine xame û pênûsên xwe, bi ser zaliman ve diçin! Ma malneketino, hûn hê jî bi min û wan tev bawer nakin?

Zana Farqînî

TÎR

Musa Anter



Tu di dilê neteweya xwe de dijî

Ez ji kar vegeyîyam malê. Bi ketina hundir re min dît ku, rûyê kevaniya min ne weke her rojê ye. Min pirsî: "Çi bûye?" Got: "Nûçeyêke pîr ne xweş ji welêt heye. Musa Anter jî kuştine." Hêstir bi çavên min ketin, xwazî di gewriya min de sekinî. Min serê xwe hejand: "Gelo rast e?" Bi telefonan hevalan bersiv dan û gotin: "Erê rast e, mamoste hatiye kuştin."

Dema em hîn biçûk bûn me navê Musa Anter dibihîst û navê pirtûka wî "Birîna Reş" diket guhên me. Em şa dibûn, me dizanibû ku, xebata gelê me li bakurê welêt jî berdeyam e. Baweriyê me bi doza me xurt dibû, lê her tim em bendewarên şoreşa bakurê welêt bûn. Êdî va ye, şoreşa rast li bakurê welêt dest pê kir û li seranserê Kurdistanê belav dibê. Mirovên mezin, peyayên payebilind, ronakbîr û zana nola Musa Anter jî di nav de ne. Ma çawa dijmin, wê har û dîn nebe? Erê ev dijminên hov, bêdîn, bêîman, bêwijdan welatê me li me dikan girtîgeh û zîndan. Kurdistanê dikan meydana êrîş û talanan, jin û minalan (zarok), kal û pîran didin ber qurşinan, namûsa mirovan erzan dikan.

Ey dijminên xwînxwar, bi kuştinan dozên gelan çareser nabin. Heya welatê me dagirkirî be, vehes ji we re tune ye. Li her derê serhildanên bindestan her tim nîşanê serkevtinê ne. Êdî derkevin ji welatê me. Ne tenê Kurd namire, lê belê rojên serxwebûn û azadiyê nêzik dibin. Kurdistan ji we re nabe gulîstan.

Şehîdên me di dilên me de dijîn. Navên şehîdên me, riya şehîdan, gorên wan çirayên geş in li ser riya neviyên me.

Gundî Dilbers

Gerîlayê pîr ê rehê min ê mirinê

Xewnên bi qîrîn li ber xelasbûnê ne. Çiya ji xewnên xwe şiyarbûne êdî. Dema min nûçeyê mirinê sibehê di rojnameyan de xwend, damarên çavên min ên helbestan bédeng man, ez rawestîm, bédeng mam. Min nekarî tifa xwe biqurtînim. Ez giriyam, giriyam û giriyam.


Min ê te halo jî bidîta, an newxe ev nûçe derew bû? Min nedixwest bawer bikim. Ez meşiyam, riya min kurt bû. Hişê min hate serê min. Min derbeyeke din jî xwaribû. Min her tim halo wînda bikire hezkeriyên xwe. Lê, ez hîna ne amade bûm ji veqetînê wiha re.

Çirûskek jî bes bû, bi rastî
Ji bo pêtgirtina dilan
Diherikîn rûbar
Stranên jan û eşan
Cografya mîna birîndar
Bi gazin diçirîya
Eywax eywax
Dîsa şivano distire
Diyarbakir, Diyarbakir
Lanet dibarin li serên bi lanet
Yezdan dikevin nav bédengiyê
Çiya kilamên evînê dibêjin
Vedimire
Gula heftber
Gerîlayê pîr ê rahê min ê mirinê.


Osman Eren

Jûjî...

Doğan Güzel



“Mebûsekî me kuştin”



Mebûse DEP'ê Naif Güneş ji bu hedefa jopên polisên.

Navenda Nûçeyan- Mebûse DEP'ê yê Mêrdînê Mehmet Sîncar û ji rêvebirên DEP'ê Metîn Özdemîr, roja 5'ê îlonê li Batmanê ji aliyê kontrgerîla ve bi êrişeke çekdar hatin qetilkirin. Mebûse DEP'ê yê Batmanê N. Toğuç jî birîndar bû.

Piştî qetilkirina wan, li Batmanê qedexeya derketina derve hate îlankirin. Dora rojê dewletê bi tehdîtan malbata Metîn Özdemîr razî kir û cenazeyê wî bi destê polisan veşart. Ji bo merasimê rêvebirên DEP'ê cenazeyê Mehmet Sîncar anîn Enqerê, lê dewletê nehişt merasim çêbibe û hêzên dewletê bi xwe ce-

nazeyê Mebûse DEP'ê birin Qoserê (Kiziltepe) û li wir bi beşdariya polis û leşkeran veşartin.

Li ser van rêlibergirtin û qedexekirinê dewletê yê li dijî her cure pêkanînan demokartik Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya, gote ku ev gasp e û hin tişt di destê partiya wan de jî heye ku bikin.


Bi qetilkirina Mehmet Sîncar û Metîn Özdemîr re dewletê li Batmanê derketina derve qedexe kir û kontrol û lêgerînê li Batmanê zêde kirin. Ji bo ku gel bi awayekî girseyî li dijî dewletê meş û livbaziyan protestoyî pêk neyne, tedbirên leşkerî zêde kirin û bi sedan kes xistin binçav.

Rêvebirên DEP'ê, roja 6'ê îlonê cenazeyê Mehmet Sîncar ji morga Nexweşxaneyê SSK'ê ya Batmanê bi balefireke taybetî, ji bo ku roja çarşemê li Enqerê bi beşdariya partizanên DEP'ê merasima wî bê çekirin, anîn Enqerê danîn Nexweşxaneyê Hacettepeyê û bi dorvegerî li ber nobet girtin.

Di vê navê de navenda DEP'ê îlan kir ku, wê merasima dewletê ji bo Mehmet Sîncar qebûl nekin, ala Tikiyê li çardara wî nepêçin û li gor biryara partiya wî nijanga (çardar) wî ala DEP'ê bipêçin, merasima wî çêbikin û bibin li Qoserê defin bikin.

Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya, sebebê vî biryarê wiha anî zimên: “Ji aliyê kesên li ser serê dewletê ve endam û rêvebirên partiya me di nav Meclîsa Tirkîyeyê de wek hedef hatin nişandan. Li meclîseke ku tê de biryara kuştina me bê dayîn kes dengê xwe dernexe, em li wê meclîsê tertîpkirina merasimê rast nabînin.”

Piştî standina vî biryarê, DEP'ê dest bi amadekariya merasima roja çarşemê kir. Şeva ku sêşemê bi çarşemê ve girê dide, hate fêmkirin ku niyeta dewletê qet tune rê bide merasima DEP'ê. Êvara sêşemê hemû riyên ku ji derve tînan Enqerê, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin û tu kesê Kurd bi hemdê xwe neexistin nava bajêr. Li aliyê din



Gelek kesên welatparêz jop û darên polisan birîndar bûn.

bi hezaran kesên din ên ku amadekariya hatina Enqerê dikirin li Stenbolê, li Izmirê, li Edenê û li gelek deverên din hatin sekinandin û nêzîkî hezar kes xistin binçav.

Tevî van tedbîr û rêlibergirtinên dewletê diya jî bi hezaran kes ji derve xwe gihandin nava Enqerê; li Enqerê jî hemû Kurd û Tirkên welatparêz bi mebesta beşdariya merasimê ber bi Kolana Necatîbey ve ku, navenda DEP'ê lê ye meşîyan.

Lê hêzên dewletê hemû derdorên Kolana Necatîbey girtibûn û nedihîştin yek mirovek bi tenê jî, darbasî nav vî kolanê bibe. Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya bi xwe jî piştî hewldanên mezûn bi kotek û heft bela xwe gihande navenda DEP'ê.

Ji deh hezarî zêdetir polis li dora Necatîbey û li deverên navendî yên Enqerê bi cih bûbûn û nedihîştin çar mirov werin ba hev, derhal mudaxele dikirin û ew didan ber jop.

Di vê navê de, diya jî li çend deveran bi sedan Kurd kom bûn û li dijî vî tewra dewletê meşîyan û slogan avêtin.

Heta saet 1'ê nivro polisan nehişt kes bikeve Kolana Necatîbey. Piştî saet yekî polisan riyên ku diçin Necatîbey vekirin û avahiya DEP'ê ji welatparêzan tijê bû. Li devê deriyê avahiya DEP'ê jî bi sedan kes civiyan. Hîna di ser re saetek derbas nebûbû, ji nişka ve polisan bi jop, dar û boriyan

hesin êrişî ser gel kirin. Ser çavê nêzîkî bîst kesan di nava xwîne de man û nêzîkî sed kesên din jî, ji jop û darên polisan para xwe standin. Di dema van êrişan de mebûse DEP'ê yê Sêrtê Naif Güneş jî bû hedefa heqaret û jopên polisan.

Li aliyê din, rêvebirên dewletê ji bo rakirina cenazeyê Mehmet Sîncar li navenda DEP'ê bi telefonê digeriyan da ku wan razî bikin ku, bi beşdariya mebûs û rêvebirên DEP'ê merasimeke biçûk çêbikin û bi lezgîniyê cenaze bibin Qoserê defin bikin. Bes navenda DEP'ê daxwaza Wezîrê Karê Hundirîn red kir û daxuyand ku di van şertên rêlibergirtinan de wê beşdarî merasimê nebin û ta ku programê DEP'ê neyê qekûlkirin wê eleqeya xwe ji cenaze neynin.

Piştî ku DEP'ê teklifa dewletê qekûl nekir, hêzên dewletê bi xwe roja 9'ê Îlonê ber bi nivro ve cenazeyê Mehmet Sîncar bi balefirê birin Amedê, ji wir jî bi helikopterekê birin Qoserê û li wir bi beşdariya polis û timên taybetî veşartin.

Bêyî ku cenaze bê definkirin, dewletê xwest ku malbata Mehmet Sîncar beşdarî merasimê bibin, bes malbata wî ev daxwaz red kir, beşdarî nebû.

Bavê Mehmet Sîncar, Tewfîq Sîncar li hember vî tewra dewletê wiha got: “Cenaze ne yê me ye, ji ber ku ew bi vîna gelê xwe wek mebûs hatibû hilbijartin. Emê jî li gor biryarên partiya wî bilivin. Destdanîna dewletê ya li ser cenaze gaspkirina maf e”.

Ji gelê Qoserê tu kes beşdarî cenaze nebû û hemû esnaf û şofêran bi girtina kempeng û kontaxanê dewletê protesto kirin.

Li hember vî neheqî û bêadaletiya dewletê li gelek deveran kempeng hatin girtin. Sazî û komeleyên demokartik jî hîkûmetê protesto kirin.

Li dijî vî helwesta dewletê, rêvebir û mebûsên DEP'ê ji aliyê gel ve tînan vexwendin ku, dest bi protestoyan cur be cur bikin û xwe ji meclîsê bikişînin.

ROJEVA WELÊT

Qatil dewlet e

Şerê qirêjî yê li Kurdistanê ku li hemberî gelê Kurd, ji aliyê dewletê ve tê meşandin, berê xwe da mebûsên Kurd jî. Mebûse DEP'ê yê Mêrdînê Mehmet Sîncar, li Batmanê bi destê kontrgerîla hate kuştin. Kuştina Mehmet Sîncar, bi organîzasyona Waliyê “Herêma Rêveberiya Taybetî” Unal Erkan ku serekê kontrgerîla ye jî pêk hat. Ev yek bi beyanên polîsekî ji Emniyeta Diyarbakir îsbat bû (Özgür Gündem/ 10-9-1993). Weke ku diyar bûye yek ji qatilan jî îtîrafker Alaattîn Kanat e. Alaattîn Kanat di organîzekirina gelek cinayet an de raste rast cih girtiye.

Kuştina Mehmet Sîncar, îşareta provakasyoneke dorfireh e. Ev cara yekemîn e ku, dewlet navê Hizbullahê di cinayetekê de derdixê pêş û dibêje, qatil Hizbullah e. Armanca vî provakasyonê jî nû ve berîhevdana Hizbullah û PKK'ê ye ku, demê berê bi protokolekê şerrawestî îlan kiribûn. Piştî ku Hizbullah bi PKK'ê re li hev hat û dev ji êrişên ser welatparêzan berda, dewlet ket tengasiyê mezûn. Lewre êdî nikaribû di kuştina welatparêzan de bepirsiyariya xwe veşêre.


Dewlet bi tewra xwe ya li hember programê DEP'ê ya ji bo merasimê cenazeyê Mehmet Sîncar, careke din jî rûyê xwe yê pîs eşkere kir. Cenazeyê Mehmet Sîncar, ji aliyê dewletê ve hate revandin. Tevî hemû sozên serokkomar û serokwezîra Tirkîyê ku digotin dê cenaze bi serbestî bê rakirin, Walîtiya Enqerê dest danî ser cenaze û neda rayedarên DEP'ê. Bi hezaran kes ên ji bo beşdarî merasimê cenazeyê Mehmet Sîncar bibin derketibûne rê, li ser riyên hatin binçavkirin. Li ber derê Navenda Giştî ya DEP'ê, polisê êrişî ser gel kirin û bi dehan welatparêz birîndar bûn. Dû re jî ev mejiyên faşîst, cenazê Mehmet Sîncar revandin û bi serê xwe veşartin.

Em li vir bang dikin ku, qatil dewlet e. Dewlet bi vî cinayetê, di rastiya de gulle berî mejiyê xwe daye. Mehmet Sîncarên gelê Kurd gelek in û bi kuştinê naqedin. Lê dewlet bi her cinayetê re, pêpelûkeke din jî, ber bi gora xwe ve dişiqite û piştî ku pêpelûk biqedin, dê tu kes tune be ku çengek ax bi ser ve dake.

FESTİVALA KURDISTANÊ YA NAVNETEWYÊ

Roja 4'ê Îlonê li Frankfurt Almaniyayê dîlana gelê Kurd bû. Tevî hemû rêlibergirtinên dewletên împeryalist, zêdeyî 100 hezar Kurd di Festîvala duyemîn a Kurdistanê ya Navneteweyî de gihîştin hev. Festîvala Frankfurtê hê jî ya par ku li Bochumê pêk hatibû, bi coştir û girsetir bû. Bi sedhezar Kurd, bi organîzasyonên wiha mezûn digihên hev û xwe li gorî şertên dewletekê bi rê dixin. Ev yek di dilê neyaran de dibe tîrseke mezûn û ji bo rê li ber organîzasyonên bi vî rengî bigirin, çî ji destê wan bê, dikin. Lê heta niha tu hêz nikaribûye xwe li ber girseyan gel ên birêxistin bigire, dê ji îro pê ve jî nikaribin.

Festîvala duyemîn a Kurdistanê pîroz be. Em wê mîna mizgîniya serfiraziye dinirxînin.



Enqerê roja 8'ê îlonê bûbû bajarê polisû panzeran.

Frankfurt jî bi kesk û sor û zer xemilî

Selîm Biçûk

Frankfurt- Roja 4 ê meha Îlonê jî dê bibe xelege ronak û geş di rêveçûna meşa azadiyêke de. Bajarê Frankfurtê sîng û baskên xwe ji bo festîvala Kurdistanê ya navnetewî ya 2'yan vekiribû. Tevî hemû zoriyên dewelata Tirk û hevalbendên wê, festîval bi serketinî hat li darxistin. Li hember daxwaz û vîna gelê me tu zor nikare raweste. Di serî de dewlet û polisên Alman ku dixwestin heta roja dawiyê nehêlin ev cejn li darbikeve. Lê hemwelatîyên me yê Kurdistanî, mîna pêlên deryayê jî her hêlê ve diherikîn rê û kolanên Ewropayê tev bi kesk, sor û zeran xemilîbûn. Berê wan li Frankfurtê bû ji bo bîbîne şahid li dadvaniya doza me. Êdî tu hêz nikaribû van gelan rawestîne. Lîstgeha Frankfurtê dihejîye. Deng, qîrîn û bang esman diçirandin. Li her koşeyên lîstgehê wêneyên Serok, şehîdan û alên rengîn bûn. Li ser giyayê hêşîn di navenda lîstgehê de jî, bi al û wêneyan, bi kesk û sor û zer hatibû xemilandin. Êdî sed hezar dil bi hev re lê dida.

FRANKFURT BÛ KURDISTAN

Rehên (damar) xwe dikirin yek, bi yek xwîne tevdiçerîn û hêdî hêdî li ser pêlên xwenên ku, yek bi yek, kêlî bi kêlî dibin rastî, difiriyên deşt, gelî, çiya, sînor û derya derbas dikirin. Ber bi Kurdistanê ve diçûn, ber bi kaniya hebûn û jîne ve xatirê xwe ji koçerî, penaberî û biyaniyê dixwestin.



Hozan Ferhat Tunç

Programa festîvalê dest pê kir, gel ji wan xewnên şîrîn şiyar kir.

Li hewa xist, esmanan li ser perê ewran û bir, tevî lîstgehê û Frankfurtê bû parçeyek ji welat. Di dilê welat de civîn, welat jî di sed hezar dil de cih digirt. Spiker derket û wiha axivî: "Rojek min dît germ û keke kel e. Hêrs diket Dihê û Şemzînan. Dikelîya germa havînê êdî li hember agirê EGİD bûbû hênîkahî Qîriya Şemzînan û got: "Namîre, namîre Kurd. Ew gora ku hatibû çêkirin. Ew gora ku ji me re kolabûn qelîşî kemerê ku ji me re danibûn çirîya. Ew roj 15'ê Tebaxê bû. Roja Şiyar, Bedran û Egîdan bû. Hevalino! Hûn ên ji dût hatine, yê ji nava pencên metropolên dijîman, ên ji welatên xerîbiyê hatine. Ên ji Dêrik, ên ji Silvan, ên ji Amedê hûn bi xêr hatine Festîvala Navnetewî ya Kurdistan..." Û êdî diwarên listeyê, çardorên bajêr dihejîyan bi dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "Bijî 15'ê Tebaxê" û "Bijî PKK" û dîsa sipîker dertê, çepik û dirûşme hatin birîn. Ji nava bêdengiyê axaftina wî pêl dide: "Dost û gelê me deqe bi deqe, saet bi saet her demê di bîra me de ne. Jiyan dibin. Di xwîna me de ne şehîdên me. Berî ku em dest bi programa xwe bikin girîng e ku, em wan serokên xwe yê

ku nemir in û jiyan dibin û jiyanê didin me, bînin bîra xwe. Ji bo bîranîna şehîdên serxwebûn û azadiya Kurdistanê em we hemûyan dawetî keliyekê li ser piyan dikin." Piştî bîranîna pakrewanan, rêber û



Hozan Sefkan

rêzanên têkoşîna me programa festîvalê wiha hat rêzkirin:

Ji gelek welatan mêvan û dostên me hatine ji Medîco International, Serokê Komela Mafên Mirovan, endamê li Îngiltereyê û hwd. Mêvanên me wê bi axaftinên xwe festîvala me pîrozbahî bikin.

Komên govendê; koma govendê ya Yunanistanê, ji (80) kesî, koma govendê ya Hunerkom, koma gavenda Komkar, Koma govenda Kildaniyan.

Beşa muzîkê: Koroya Hunerkom û



Hozan Seyitxan

xwe digihînin hemû dinyayê û hemû dinya îro li me guhdar dike. Doza gelê Kurd jî guhdar dike. Di vê yekê de şadîmanîyêke pîr xurt e û tu dilê her mirovê Kurd wekî helbest şabûnek tê de he-

ye. Ez jî mîna endamê Hunerkom û Koma Bêrxwedanê dibêjim ev şadîmanî li ban min pîr mezin e. Ev cara duyemîn e ku festîvala Kurdistanê çêdibe û tê pîrozkirin. Di dîroka gelê Kurd de tiştekî wiha nehatiye çêkirin, ev yek jî bi hêza şehîdên me, bi qeweta gerîlayên me pêk hatiye. Bi saxiya gerîla, gel û Serokê me, em we spas dikin."

Hunermend û şanoger Emele: "Di rojêke wiha de em gelekî dilxweş dibin. Hem di hêla warê çandî de, warê siyasî de yekîtiya gelê Kurd me

damên Hunerkomê me hazir kiribûn, tenê ji bo xebata kulturî. Her wiha jî hêlên têkiliyên derve, ji hêlên amadekirina xwarin, aborî û ji her hêlê ve ev bêhtirî mehekê hazirî dibin. Ji hêla dewleta Almanya ve bi taybetî û bi alkariya dewletên din gelekî xwestin ku astengiyên li hemberî me derxin. Carekê cih jî me standin, lê dîsa jî me girt. Bi dehan kelem jî me re derxistin. Heta îro di hundirê festîvalê de gelek pankertên me jî daxistin, lê dîsa jî bi hunera gel me festîvala xwe berdewam kir. Ez nikarim festîvala îsal bikim wek a par, a îsal xebateke bêhtir jê re hatiye kirin. Tevlîbûneke bêhtir heye. Ji hêlên hunerê ve jî, **Hozan Seydixan dibêje:** "Berî her tiştî ez gelekî kêfxweş û bextewar im ji bo rojnemaya Welat ku di rojê şahîyêke wiha bi nav û deng de ku, bi sed hezar gelê Kurd li hev civiyaye, tevî dengê gelê dibe. Ev şahîyêke mezin û bi nav û deng e.

NAVE KURD GIHIYA DINYAYÊ

Navê Kurd û Kurdistanê digihîne raya dinyayê. Ji hêla siyasî û diplomasiyê ve jî rê û demeke nû vekirîye. Ji bo gelê Kurdistanê, ev jî roja serkeftinê nêzîktir dike, çand û hunera gelê Kurd jî li vê derê jî bo raya giştî ya cîhanê bi qedr û qîmetê xwe hate qebûlkirin.... Bêyî festîvalê me bi hazirîyêke mezin nêzîkî 200 endamî ji bo muzîk, govend û orkestrayê ji Koma Bêrxwedanê Hunerkomê bi hev re amadakeriyên me hebûn. Kedkarên me deke mezin di vê hêlê de dan û ji bo vê şahîyê hunerên xwe rêxistin."



Hozan Peyvan

Hozan Ferhat Tunç: "Niha ev dîmena ku li ber çavên xwe dibînim, civandina hezarên gelê Kurd li vir, berî her tiştî gelê me nasnameya xwe ji raya giştî ya cîhanê re îspat dike. Bi vê festîvalê, pêwîst e hemû cîhanê vê rastiye nas bike vê hêrs, kêf û şahîya gelê Kurd bibîne. Ji hêla din ve hovîtiya ku li bakurê Kurdistanê dewlet bi rê ve dibê, nemaye di awayê veşartî de ku em bibêjin kontr-gerîla ye. Ev qirkirinê dawî li Batmanê, êdî dide xuyakirin ku eşkere dewlet pê radibe. Bangên mirovahi û aşiyê yê gelê Kurd jî êdî bêbersiv bi şûn ve vedigerin. Dewlet tu rîyan nas nake, bi tenê hovîti, şer û kuştinê çare dibîne.... Dema ez vê dîmenê dibînim, êdî ji kêfxweşiyên ez nizanîm çî bibêjim.

Ez hêvîdar im ku, rastiya me cîhan hemû bibîne." Şairê Kurd ê bi nav û deng **M. E Bencewîni** dibêje. Ez jî mîna rawêşên berekî dema vê rawêşê dibînim paşeroja Kurdistanê zor nêzik tê ber çavê min. Û tê ber çavan ku serxwebûn û azadiya Kurdistanê bi destê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê û Partiya Karkerên Kurdistanê dê pêk bê."



orkestrayê Koma Sasê Bo ya Afrîkayê, Koma Azad, Kizil Irmak, Koma Bêrxwedan ên orkestrayê, Hozan Hesen, Lor, Hozan Ferhat Tunç, Hozan Hesen Şahîn, Hozanê gelê yê Finlandî Lasî Matela, Hozanê Qibrîsî Spanos Corciyos, Hozan Beser Şahîn.... û hwd.

Çend lîstik û fikir ji Koma Bêrxwedanê Hunerkomê

Axaftin bi sê zîmanan Kurdî, Tirkî û Almanî. Gelek xalên din ên balkêş di nava programê de cih digirtin û festîval xemilandin.

Min bi navê rojnemaya Welat ev pîrs jî çend rawêşên bîr û hunermendan kir. "Hûn çawa festîvala Kurdistanê ya Navnetewî ya 2'yan dinixînin? Heste û dilên we çî dibêjin? Bersivên vê pîrsê wiha rêz bûn.

Hozan Peyvan: "Bi rastî festîval jî bo gelê Kurd jîyanek e, jiyanê tîne zîman, ewqas mirov tîne ba hevdu. Bi rihê neteweyî, bi rihê yekbûnê ber bi xaka welat ve gavekê diavêje. Di riya vê festîvalê de, em jî deng û behsên

di vir de dît. Em hewqasî dilxweş bûn, eger baskên mirov hebin mirov dikare biîfere jî, bêhtir mirov nikare tiştekî bibêje. Hat xuyakirin ku, ev gel dikare bi vî awayî gelek tiştan bike, tu hêz û qewet jî nikare vê yekîtiyê tune bike.

Hozan Tirêj: "Rojek wek îro îspat dike ku PKK ne wek ku em dibihîzin Partiya Karkerên Kurdistanê bi sed taqî hîn xurtir e. Eger îro li Ewropayê sed hezar mirov digihîne hevdu. Gelo li welat çiqasî dikare bigihîne hevdu. Dema mirov dibêje Partiya Karkerên Kurdistanê an ku gelê Kurdistanê kombûna sed hezar mirov li xerîbiyê tiştekî mezin e. Du sed kes bi hev re derdikevin lîstikên folklorî. Ji hemû welatên dinyayê hatine. Ji Qibrîs, Yewnenîstan, Belçîka, Finlandiyayê... tiştekî zêdeyî wêşê ye, mirov nikare bi gotinan bîne zîman."

Ji hêla amadakeriyên festîvalê ve hozan, şanoger û nivîskar H. Sefkan dibêje: "Niha Em bêhtirî mehekê ez bi xwe di hazirîyê de me. Nêzî 150 en-

PÊNÛS



Amed Tigris

Harbûn nîşana têkçûnê ye

Dewleta hov a Tirk her ku derbe dixwe har dibe. Ji derî terorîzmê tu pîvan û prensîbên dewletê pê re neman. Wiha gêj, xînt û har bûye ku êdî bi roj, li nav bajêrê Batmanê, li ba qereqola polîs êrîşî parlementerên Kurd dike. Parlementerê bajarê Mêrdînê Mehmet Sîncar şehîd dike.

Armanca dewleta terorîst a har gelekî vekiriye ku ew ji serî ve dixwaze ku di warê legal û demokratîk de tu rêxistin, dem û dezgeh tune bin. Têkiliyên tekoşîna azadiyê bi vê re hem ji gel qut bikin û hem jî di warê navneteweyî de bêdeng bike. Têkoşîna bi tenê di gund û çîyan de bi sînor bike. Ji ber vê yekê jî di warê legal û demokratîk de yên ku nerehet dikin, aciz dikin di serî de Partiya Demokrasi (DEP) ye. Di warê çapemenî de Ö. Gündem, Welat û weşanên din ên Kurdan in. Ji ber vê yekê jî zêde bi ser DEP ê û Ö. Gündemê ve diçin. Endamên DEP ê û rojnamevanên Ö. Gündemê şehîd dikin. Yên mayîn jî diavêjin zîndan.

Şehîdkirina hinek kesan merhaleyên tekoşîna gelê Kurd nîşan dide. Bi şehîdkirina wan gav û merhaleyên bilind û girîng dest pê dikin. Şehîdbûna van kesan di tekoşîna gelê Kurd de dibe Mîlad. Wek şehîdbûna Mahsûm Korkmaz, Mazlûm Doğan, Vedat Aydın, Mûsa Anter û Mehmet Sîncar...

Şehîdkirina hinek kesan merhaleyên tekoşîna gelê Kurd nîşan dide. Bi şehîdkirina wan gav û merhaleyên bilind û girîng dest pê dikin. Şehîdbûna van kesan di tekoşîna gelê Kurd de dibe Mîlad. Wek şehîdbûna Mahsûm Korkmaz, Mazlûm Doğan, Vedat Aydın, Mûsa Anter û Mehmet Sîncar...

Bi şehîdkirina Parlementerê Kurd Mehmet Sîncar re, dewleta terorîst xwe da dest. Mêrkuj hat girtin. Mêrkuj ne ew kesê ku hatine girtin an jî bîst girtin in. Belê rast e mêrkuj sê kes in. Hersê jî ne li Batmanê ne, li Ankarayê ne: Serokomar Sulayman Demirel, Serokwezîr Tansû Çiller û Serokleşger Gureş bi xwe ne. Yên ku rê nîşanî wan dan jî medyaya Tirk bi xwe ye. Ew medya Tirka ku ji aliyê hikmet û leşkeriyê ve hatin kirin. Serê van bi ava û xwîna kemalîzmê hatiya şuştin. Rojnameyên Babi Alî ne. Kanalên tv. yên dewletê û yên taybetî ne. Bi mehan in ku dinvîsandin û digotin "Qatil ne li çiya ne li meclîsê ne". Wekî Oktay Ekşî, Ertûğrûl Özkök, Raûf Tamer. Emin Çölaşan, Yalçın Doğan, Engin Ardiç, Günerî Cıvaoglu, Meriç Köyatasi, Mehmet Barlas û hwd. Ev rojnamevanên xwefiroş ku di xizmeta kontir gerilla de ne, heta doh digotin terorîst di parlemantoyê de ne; niha jî li ser kuştina Mehmet Sîncar dilê xwe dişewitînin. Qaşo li dij kuştina wî derdikevin û di sa di nav nivîsarên xwe de dijmintiya gelê Kurd dikin. Berê top û tîfingên xwe dane DEP, Ö. Gündem û PKK. Bi ser re jî hêzên dewletê diparêzin. Ew dixwazin hêzên dewletê yên ku bi sînc ve hatine girtin derxin paqijiyê. Dixwazin berpirsiyarê DEP ê bixine quncikê wan bitirsînin û teslîm bigirin.

DEP divê bi xwe bawer be. Ew bi ser wan de here, ji ber ku ew mêrkuj in, sîncdar in. Li ser sînc hatine girtinê. Wiha xuya ye ku hinek berpirsiyarên ku DEP ê xwe didin serhev û dimelisînin. Di warê mediyayê de ew îmkanên ku dikevîne destên wan nikarîjn baş bi kar bînin. Nikarin program û xebata xwe bînin zimên.

Divê em Kurd li hundir û derê welat vê fersendê baş bi kâr bînin. Dewleta Tirk li der tecrît bûye. Em, wê hîn bêtir tecrît bikin. Bûyera DEP ê di warê neteweyî û navneteweyî de rojane bikin. Her wiha der û dor li medya Tirkan a xwefiroş jî teng bikin ku derewên wan derbikeve holê. Berê medya û diplomasiya dinyayê bidine Kurdistanê. Ev dem û berpirsiyariyên tevger û mediya Kurdan e.

Şeklê axaftin û xîtabê li pêşberî civakê

● Hin mirov hene ku bi saetan dipeyivin, peyvên xwe sed gîsno dikin, lê axaftinên wan ne balkêş in û vala ne. Lê hinek mirov hene, gava ku diaxivin, dizanin bê çi dibêjin. Axaftinên wan balkêş û tîjî ne, dema ku dipeyivin, pêşketinekê didin dora xwe. Bi rastî, ger mirov bixwaze tiştêkî bide dora xwe, divê mirov guhdarekî baş û bi danûstandin be. Yanî mesele ne tenê meseleya baş qisekirinê ye.

M. Egît

Di axaftinê de xîtab ji bo mirovan xisûsiyeteke gelek pêwîst û girîng e. Bi riya usûlba axaftinê, mirov di jiyana xwe de, rûmetekê û hezkirinê distîne. Ji ber vê yekê jî, çiqas mirovên rêber, ramanger û hwd. hebin, xwedî usûl û axaftineke balkêş in.

Hin mirov hene ku bi saetan dipeyivin, peyvên xwe sed gîsno dikin, lê axaftinên wan ne balkêş in û vala ne. Lê hinek mirov hene, gava ku diaxivin, dizanin bê çi dibêjin. Axaftinên wan balkêş û tîjî ne, dema ku dipeyivin, pêşketinekê didin dora xwe. Bi rastî, ger mirov bixwaze tiştêkî bide dora xwe, divê mirov guhdarekî baş û bi danûstandin be. Yanî mesele ne tenê meseleya baş qisekirinê ye.

Mirovê ku ji bo armançekê xîtabî civakê dike, girîng e ku bizanibe çi mesajî dide. Axaftin û mesajdan bi xwe jî berpirsiyariyek e. Tecrûbeyên xîtabkirinê bi xwe jî, ji tecrûbeyên salan, xwe gihandine, xwendevaniyê baş û ji keda mirovan tê.

Di civaka me de, heta niha ji bo bêdengî nepeyivîna gelek tişt hatine gotin. Weke mînak: Filankes çi bi terbiye ye û hurmetkar e, li ba mezinê xwe devê xwe venake. Nizanim filankes kevîre giran e û hwd. Bi rastî ev gotin bi plîranî jî bo jinan dihatin gotin. Yanî ji xwe hêvîkirin, îhtîram û hurmet tev bi bêdengiyê ve dihatin girêdan. Lê di dema îro de, ev tişt hinek hatine şikestin.

Axivîn û xîtabkirin, bi xwe jî huner û qabiliyeteke e. Hinek mirov hene, bi riya axaftinê nikarin xwe îfade bikin. Lê bi riya nivîsandinê bêhtir dikarin xwe îfade bikin. Hinek mirov hene ku bi saetan dikarin diaxivin lê, nikarin wan tiştên ku dibêjin birijînin ser kaxez. Tamûla wan î nivîsînê nîn e. Di nava gel de gava mirov digere dibîne ku hinek hene ji aliyê çandê ve dagirtî ne, bi saetan dikarin çîrok û meseleyên gel bînin ziman. Lê nikarin binivîsin. Ev yek ji bo gewendeyan (mitrib) jî her wisa ye. Bi ya min ev yek ji bêhêvotîna (bêtalîmî), pasîvbûnê, ji girîng nedîtina nivîsînê pêk tê.

Piştî hilweşîna Romayê ye

kare hîs û ramanên xwe di pişt hinek gotin û peyvên de veşêre. Lê mirov nikarê zîmanê xwe yê lebata bedenê veşêre.

Di xîtabkirinê de, divê axivkar reaksiyon û lebata guhdaran jî li ber çav bigire. Pêwîst e rewş û kultura guhdaran jî li pêş çav bigire û bi zîmanê gel biaxive. Axaftin, ne bi tenê derbaskirina westê ye. Divê posîdeyê baş û zanebûnekê li ser mirovên guhdar bihêle. Mirovê ku di platformekê de tiştêkî bibêje, divê ji berê ve amadekirî be. Carina hinek hene pirr zorê didine xwe, yanî divê îlahî gere ez ji tiştêkî bibêjim û li derveyî naverokê, gotinên ku hev û din nagirin dikin. Ger gotinên mirov, ji yên ku hatine gotin nûtir û cudatir nîn bin, neyêne gotin çêtir e.

Di semîner an konferansê de, divê berî destpêkê salon, mîkrofon û hwd. bêne kontrolkirin. Di vî warî de, heta niha di civînên me yên li Ewropayê de gelek kêmasî derketine. Ev jî li ser beşdar û mêvanên civînê bandoreke neyînî dihêle.

Divê kesê axivkar, di civîn, semîner an ji konferansan de bi baweriyê xurt û bi cesareteke mezin here bi ser meseleyan de û karibe nebêze guhdaran di destê xwe de bigire. Di xîtaba xwe de, divê weke ku yek bi yek, bi mirovan re dipeyive bi çavên xwe guhdaran kontrol bike.

Axaftina ku bi kedekê hatiye amadekirin û ne ji kaxezê bê xwendin tesîra wê gelek mezintir e. Divê neyê ji birkirin ku, axivkariyê xurt bi tecrûbeyên salan û ji zanebûnekê kûr tê. Tiştêkî din jî gelek girîng e. Axaftinê dîr û dirêj û belavbûyî, xewa guhdaran tîne. Gelek caran, ger guhdar fedî nekin, hewl didine xwe ku ji civînê birevin. Girîng e axaftinê kin be û ser û binê axaftinê hev û din bigirin.

Meseleyek din jî ev e ku, hinek heval dema ku diaxivin rewşa hevalên li pêşberî xwe li ber çav nagirin û guhdaran mecbûr dibînin ku, bi saetan li wan guhdarî bikin. Ev jî xelet e û divê axivkar rewşa guhdaran li pêş çav bigirin.

Serxweşî

Qetilkirina Mebûsê DEP'ê Mehmet Sîncar û ji rêvebirên DEP'ê Metîn Ozdemîr her çiqas em xistibin nav dilêş û xemgîniyê jî, bawerîya me ya bi serkeftina tekoşîna neteweyî neşikandiyê. Ew di riya azadî û demokrasiyê de ji bo gelê xwe şehîd ketin. Serê malbata wan û gelê me sax be.

Kargêriya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Kîsê reş û rastiya dîrokî -2-

Cûdî

Dibînin bi çavên serên xwe ku, vê rojê şoresger bi rastî bi hîn û bi hîmeke xurt, bi xwîna xwe ya giranbuha di riya serxwebûn û azadiya gelê Kurd de bi rê ve diçin, dibînin û dibihîzin, bi guhên xwe livbaziyan li hemberî dijmin dikin, dibînin raperîn û serhildanên li welatê wan radi-bin, lê mixabin çavan dimiçnin ji bo nebînin, guhên xwe digirin ji bo nebihîsin, çima? Ji ber ku qel in, newêrek in, derewvan in, ji bo dipirsim çî didin ber rûyên xwe? Hincetên wan çî ne?

Ji bo reva xwe dibêjin em hevalên Mesûd in, yan hevalên filan û bêvan in, lê çima vê gotinê dibêjin? Armanca wan jê çî ye?

Rast e, ew xwedî bawerî ne ku Mesûd dikare yan dixwaze ji dilê xwe xebateke rast û durist bike ji bo wan yan ji bo gelê Kurdistan? Rastî, ew jî dizanin ne ev e ji ber ku xebata rast û durist ew e ya ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistan û gelê Kurdistanê be û xebateke wisa ne xema wan e, lê dîsa pirs dihê tê ditin çima xwe bi KDP'ê nav didin? Bersiv jî ev e: Ji ber ku piçeke kindik ji awelatperwerî bi wan re peyda nabe û tu caran jî ne amade ne, xebateke rast yan bi rastî ji welatê xwe re bikin. Yan ji bo gelê Kurd û doza Kurdistanê yek katjimêrekî saetekê biwestin, dîsa çima?... Ji ber ku bêbawerî ne, baweriya wan, heya bi kesaniya wan bi xwe nayê û xwe nabînin mirov wek her miroveke û geleke di cîhanê de dijî û mafên mirovatiya bi rûmet ji xwe re nabînin pêwist xuya ye, kesê daxwaza maf û welatê xwe neke wê ne dilxweş jî be ku, hinekî din wan bîajon ber bi wê hêlê ve.

CENGA BÊ PERE

Ji bo van tiştan dema dibêjin em hevalên PDK'ê ne ew baş dizanin ku ji bilî wan ne ew kes û ne ew partî ne wê wan û ne zarokên wan wê bibin û dîr bikin ji wan: ya ji van pêwisttir pereyan jî, ji wan naxwazin. Belê ev ji wan re pirr pêwist e û ev bes e ku wê gotinê bibêjin... Em hevalê PDK'ê ne.

Dizanin aboriya cengê bê pere nabe, pêsketinê bê aborî nabe û PDK an vê tiştê nake ji bo gelê Kurdistan û ji ber ku çek avêtiye. Bi teslimkarî aboriyê cengê jî, jê re ne gerek e. Vêca peran ji wan naxwaze û zarokên wan ji wan dîr nake-

Hişê xwe bixwe serê xwe, li tîpên zanebûnê vegere, çavên rastiye hilgire. Careke din li pirtûkên PKK'ê û belavokên wê vegere û bixwîne, ji ber ku riya avakirina jiyana rast, bi rûmet di wan de xuya ye. Nebêje ez xwendevan im, ez zana me, ji ber ku ew xwendina te girtî, tu dîr kirî ji zanîna parastina rûmeta mirovan, ne ya felata te û welatê te ye, ne ya rizgarkirina xaka te ye.

vin. Li vir dîsa kîsê reş dihê parastin û kes bi ser ve naçe.

BEDELÊ NÊZÎKBÛNA BER BI PKK'Ê

Ji van sedeman nêzîkî PKK'ê nabin dibêjin di dilê xwe de ger em nêzîkî van bibin yan bibin dostên wan wê perêyan ji me bixwazin û qîmê bi deh yan bi sed wereqa naynin, bi hezaran dixwazin. Ma ev rast e hey Kurdê ne baş? Tu rezîl î li xwe binêre, tu çî yî di nava hevalên xwe yên di kar de? Bi çî çavî li te dinêrin? Çiqasî tu xwe piçûk dibîni di nav wan de? Tu her roj çend caran xwe kole dibîni?

Ew rûmet di welatê mirov dihê parastin. Tu wek her mirovê di cîhanê de, xwedan maf î, binêre gelên cîhanê çî kirine û çî dikin ji bo welatên xwe, ji bo azadiya xwe çiqasî xwîn rijandin û dirijînin ji bo parastina rûmeta xwe ji bo van hemûya tu çî dibêji û bersiva te çî ye? Tu dibêji ramanên min hene, ramanên te çî ne? Dema tu bê welat bî tu bi xwe çî yî, tu kî yî û çî kes î? Belê ramanên sernizmiyê ji bo kîsê reş in. Nêrînen te çî ne? Ev nêrînen û ramanên te yên koleyan e, kesê rûmetxwaz be, kesê li mirovatiya xwe binêre, wek mirovan dilive.

bêrûmetî ye, ne kole be, ne nandoz be, şiyar û serbilind be, welatê xwe, gelê xwe, jiyana zarokên xwe, rûmeta mirovatiya xwe nefiroşe bi nanekî yan bi du bacanên sor, rastiya xwe dane ber çavên xwe, tu xwe dibîni ez jî te dibînim, qareqara te dikeve guhên min, gazinên te seh dikim, wê kîsê reş ji te re çî bike? Ger tu bêwelat bî, peyeyên cîhanê hemû yê tî bin, wê çî ji te re bikin, dema tu ne li ser xaka xwe bî, tu ne azad bî, di jiyana xwe de, ger tu ne mirov bî, di nav mirovan de, tu çî yî? Dema tu kole bî, dema tu xizmetkar bî ji bilî xwe re jiyana

bikin, welatê xwe nas bikin, dost û dijminên xwe nas bikin, kîjan rojê te ev kirine? Dizanim ku tu di bersivê de bêcare yî, ka ramanên te, ka zanebûna te, ka xebata te? Hiç tiştê te nîn e.

Hişê xwe bixwe serê xwe, li tîpên zanebûnê vegere, çavên rastiye hilgire. Careke din li pirtûkên PKK'ê û belavokên wê vegere û bixwîne, ji ber ku riya avakirina jiyana rast, bi rûmet di wan de xuya ye. Nebêje ez xwendevan im, ez zana me, ji ber ku ew xwendina te girtî, tu dîr kirî ji zanîna parastina rûmeta mirovan, ne ya felata te û welatê te ye, ne ya rizgarkirina xaka te ye.

Belê te xwendin standiye, ji bo çandina ramanên pejirandina koletiyê, ji bo pejirandina nandoziyê, zanabûna te xwendina te ya firotina te û welatê te ye, bi erzanî, ne erzan be, nandozî erzanî ye, zarokên xwe bi hîn neke li ser doza erzaniyê, wan neke kole, ji ber ku kolefî ne karê mirovan e, bi taybetî van rojên vê demê.

RASTIYA DÎROKÎ

Binêre xwe, binêre cîhanê tevî, binêre sosyalîstan û dewletên di nava yekîtiya wê de, vê rojê çî dixwazin? Berî vê demê jî hemû dewlet bûn. Her tiştên wan hebûn, lê tenê serxwebûn bi temami nebû, vê rojê bi coka xwîne dirijînin ji bo wê serxwebûna giranbuha û ji bo wê jî texsîriyê nakin, bi konevani, bi leşkerî têkoşîna xwe bi rê ve dibin.

Binêre Amerîka û rewşa reşan di wê derê de, ew reş vê rojê çî dikin? Vê rojê rabûne xwîna xwe dirijînin ji bo mafên xwe yên mirovati. Lê tu xwendevan î, xwedan raman î, konevaniya te tîrî sedan sala dike, lê mixabin ne ji bo serketina gelê Kurdistan, ne ji bo azadiya Kurd, ne ji bo serxwebûna welatê te, belê ji bo berdewamiya koletiya te, ji bo berdewamiya bindestiya welatê te.

Tu derewvan î, tu revok î, tu newêrek î, tu teslimkar î, ji bilî nandoziyê tiştêkî din nizanî û napejiirîni, xwendevanê qels; jiyana te, xaka welatê te hemû ketine di nava wî kîsê reş de, wî kîsê jehrê, şerm e ji te re, fedî bike, bibe mirov û vegere berî tirêna vegeerê ji te bibore û pişt re tu nagihî, vegere roj roja Kurdan e, roja gelê Kurdistanê ye û ger tu venegerî wê tu poşman bibî, belkî wê demê poşmanî kar nede te, ji ber ku gel li sextekaran nabore.



Ev gelê ku ji aliyê dijmin ve hatibû binaxkirin çawa rabû ser xwe?

Tu çî dibêji wan? Dibêji wan ez mezin im? Ez berpirsîyar im? Ewqas karker di bin destê min de ne? Tu rastiya rewşa xwe ji wan re dibêji? Hey ser nizim tu dikarî bi yekî ji wan kesan re bipeyivî, tu dikarî bibêji yekî ji wan here yan were? Rojê çend caran tu dibihîsî bi guhên xwe gotinên wan dema dibêjin te: Baş e em we xwedî dikin û em nan bi we didin û em zarokên we di dibistanên xwe de bi hîn û xwendin dikin, em kar didin we, di gel van gotinên tehl û tîrş dema ji te re dihê tî gotin tu Kurd î te welat heye rûmeta mirov di welatê mirov de ye.

Têkoşinê dike, çavan vedike li cîhanê dinêre, guhê xwe nagire, seh dike. Binêre li cîhanê gelên vê rojê çî dikin, çî dixwazin. Lê mixabin te ne çav hene, ne guh hene. Tu dibêji ger ez bibim Kurd wê min ji kar derînin û kîsê reş hew didin min û ezê ji birçîna bimirim.

XWE XAPANDIN

Xwendevanên zana û xwedan raman, ev nêrîna te ne rast e, şaş e. Xwe nexapîne, derewan li xwe neke, her kes te dibîne û rastiya te dizane, vê rojê rev ji bo te nabe, kolefî di civakên cîhanê de şermezari ye.

te hêja ye çî?

Xwendevanê bilind, tu van gotinan hemûyan dizanî û dizanî ku ev e rastiya te ye. Ji ber ku sîlehên li rûyê te ketin, hê tama wan ji bîra te neçûye, lê çima nabî Kurd û nabî hevalê rastiye û nadî peyî rêza têkoşîna durist, xuya ye ji ber ku tu qels î, xwe nas bike tu wiha yî, xwendevanê bilind, zanayê xwedî raman û ramyar û nêrînen taybetî, li xwe binêre kîjan rojê te ramanek rast ji bo serxwebûn û azadiya gelê Kurd daniye. Li pêşiya xortên Kurdistanê, kengî te gotiye wan bixwînin, zana bibin, xwe nas

Rojek ji rojên girtîgehê

Arjîn Amed

Roj li ser Birca Belek tîrêjên xwe dida nav dilê girtîgehê û hêdî hêdî bilind dibû li esmanê şîn î vekirî yê bédawî. Pê re wek gedê fedyok bi dilşahî dike-niya.


Rojek ji rojên payîzê bû. Şênkahiya ser Bircên Belek bi germa tava havînê, ji xweşikbûna xwe dûr ketibûn. Bûk û zavayên di nav şênkahiye bere bere serê xwe wek şagirdê ku, serê xwe birêz li ber mamos-tayê xwe xwar dike, bi wî qay-deyî wan jî serê xwe li ber rojê berî ber xwe dabûn. Paşê axa ku giyan dabû wan, sînga xwe ji wan re vekiribû.

Di demeke pîrr kin de di nav sînga axê de wînda bûbûn. Pelên darê, der û dora girtî-gehê zer û zerhimî bibûn. Pel ji daran roj bi roj vediqetiyân. Xweza ji her aliyê ve, bi xweşikbûna payîzê xemilibû.

Gava ku mirov der heqê xweşikbûna her çar demsalan de, li serê bifikire, berê bihara rengîn tê bîra mirov. Lê hema mirov bi kûrahî bifikire bê xweşikbûn û delaliya xwe bi bando-ra ku li ser hestê mirovan dike, tu demsal nagihîjin payîzê. Payîz çavkaniya siruştê (xweza) helbestvan û torevanan e. Her çiqas giyayê ser rûyê axan hişk kiribe jî, lê hema giyayê nav dilên mirovan şîn kiriye.

Sirra bayê payîzê, pêl bi pêl di pacên girtîgehê de tijî nav qawîşê dibû. Qawîşa kevnare bi bêhna zilm û zordariyê tije bû-bû. Lê hema bayê ji aliyê Çi-yayê Sipî, Berbihiv, Gorsê, Bûkê, Norşîn, Andok, Agirî, Munzir û heta Çiyayê Xelatê ve dihat. Pîsî û qirêjiya girtîgehê pak dikir. Li ber xweşikbûna A-

● **Li ber xweşikbûna Amedê em herdu heval di paca gitîgehê de rûniştî bûn. Me guhdariya bédengiya xwezayê dikir. Dengê bédengiyê hêdî hêdî pîrr xweş dehat guhê me. Di nava wê bédengiyê de bala me herdu hevalan li ser Birca Belek kom bû-bû. Gelo dema ku Birca Belek hat çêkirin, keda çend karkerî an jî keda çend dilî tê de derbas bûye. Lê hema mêtîngêhkar niha kirine cihê leşkerên xwe.**



Evîn û hesreta xwezayê, di girtîgehê de her diçe di dilê mirov de mezin dibe. Dilê mirov bi hesreta dilîna çiya, deşt, daristan kulîlk, pez û zarokên welatê xwe xembar dike

medê em herdu heval di paca girtîgehê de rûniştî bûn. Me guhdariya bédengiya xwezayê dikir. Dengê bédengiyê hêdî hêdî pîrr xweş dihat guhê me. Di nava wê bédengiyê de bala me herdu hevalan li ser Birca Belek kom bûbû. Gelo dema ku Birca Belek hat çêkirin, keda çend karkerî an jî keda çend dilî tê de derbas bûye. Lê hema mêtîngêhkar niha kirine cihê leşkerên xwe. Di aliyê din de jî wê demê bûyerên hatibû serê civaka me, tev di hişê min de derbas bûn. Ji aliyê din ve jî he-

vala li ba min jî wiha got: "Wa-teya evîna welat gelek fireh e. Di nav evîna welat de evîna dar û beran, gul û sosinan, kevir û zinaran, newal û kendalan he-ye."

Me herdu heval jî, hezkirina xwezayê û hezkirina welatê xwe bi hev re girêdayî didit û xeberdana me wiha dest pê di-kir: Diyalektîka xwezayî her tim, bandor li ser diyalektîka fikra mirovatîyê kiriye. Diyalek-tîk materyalîzm li ser sê beşê tekamûlê bilind dibe. Ev; xwe-za, civak û raman. Ji van yek bi

serê xwe tu wateyê naynin holê. Ji aliyê din ve jî mirovê ku li ser gelsê civakê xwar bibe û bixwaze ku bigihîje kesaniya şo-reşgeriyê, ew gereke ku ji xwe-zaya welatê xwe jî hez bike.

Bi wê xeberdana me re bayê ku ji alî çiyayan ve dihat, rûyê me û dilê me pê vedibû. Em zanin ku, bayê payîzê bi xwe re bêhna deşt û newalan, bêhna gund û bajaran, çiya û zinaran, bêhna agirê qirş û qalê gundiyan û gul û çiçekan tîne. Lê hema bi guherîna dema bi bêçareyî ya faşîzm û milîta-

rîzmê ve ba êdî wan bêhnan bi xwe re nedianî. Bi xwe re jî a-liyê çiyayê bilind, newalê kûr bêhna barûdê, bêhna xwînê û bêhna zilm û zordariyê, dengê lorîkê dayikan, dengê qije qija zarokan dianî û pê re dengê gurme gurma çiyân û dengê ti-fingên hevalan li her derên welêt belav dikir.

Di navbera xeberdanê de dayê hata cem me. Dayê bi te-menê xwe gelek mezin e lê, hema bi giyaniya xwe çardeh salî bû. Dijmin wê pîra heştê salî ji mala wê anîbûn kiribûn girtîgehê. Dayê ber tim hesreta gundê xwe dianî ziman, li ba wê nirxa cem û kaniyê gundê wê gelek mezin bû. Me her tim jê re wiha digot: "Dayê li girtî-gehê dem weke avê derbas di-be. Car carina mêvanê me tîn. Sibehê, disbe tu dê bibînî. Mêvanê me mişk, pisîk û leşker in. Mişk û pisîk car carina li der û dorê qawîşê jî li nan û avriyê xwarina digerin.

Ev hersê mevanên me ne mêvanê xêrê ne. Em tev zanin ku, ji pîsiya mişk nexweşin çêdibe. Pisîk dîsa wisan e. Wan çendê wî alî me faq danî û me nehişt mişk werin hundir. Pisîk jî em bi tirsandina daran diqewirînin. Mêvanê me yê sisiyan jî disan eynî mesele. Carek leş-ker di bin navê lêgeranê de pir-tûk û eşyayên me şewitandin, talan kirin. Di navbera bûyerê de demek kin derbas bûbû, di-san hatin. Lê hema bi berxwe-dana girtiyan nikaribûn bihatina hundirê qawîşê. Bi hevkarîyê xweş a dil û cezaxwariyan ve derê qawîşê hatibû girîtn û do-livgeriya girtîgehê bêçare ma-bû.

Me dama ku qala mesaleya mêvanan dikir, em tev pê re di-keniyan. Kal û pîrê me yên berê weke dayê bi welatê xwe ve girêdayî bûna, em dê niha ne di vê encamê de bûna. Gelê me heta niha li çand û çiyayên xwe û li axa xwe xwedî derne-ke-tibûn. Lê niha dem ne dema berê ye, dema agirê sor e ku, li serê çiyayan tê gurkirin û bi tî-na wî serhildan geş dibin. Dem dema li ser bingeha Mazlumê ku bi dengê berxwedana xwe tariya zîndan çirand, dem ew dem e. Bi wan xeberdanên me dilê dayê şa dibû, dixwest ku xeberdana me heta şeva tarî berdewam bike. Di navbera xe-berdana me de xetê helbestên Ahmet Arîf dihat bîra min. "Ê-var pîrr zû dadikeve ser girtî-gehê". Bi rastî jî êvar û sibeh li girtîgehê pîrr zû derbas dibe. Li welatê me her destpêka sibehe-ke nû di dîroka me de û di dîro-ka gelê bindest de pelekî zêrîn vedike.

Stranên gelêrî-1 Ehmedo Ronî

Hilberîna Mûzîkê ya Stran (Stran Mûzîk Üretim) di nava xebatên xwe de qaseteke ku ji klam û stranên gelêrî yên bijarte hatiye amadekirin, pêşkêşî mûzîkhezan kir.


Di vê qasetê de 13 klam û stran cih digirin. Hemû berhem ji berhemên Kurdên Ermenîstanê ne. Guhdarên Radyoya Yêri-wanê, dê ji qasetê re biyan nemînin. Bi taybetî ber-hem dê ji gelê me yê Ser-hedê re nas were. Hem jî aliyê kesên dengbêj û stranbêj ve û hem jî, ji a-liyê klam û stran ve. Qaset ji her aliyê ve otantik e.

Di qasetê de kêmasiyeke mezin balê dikişîne ser xwe ku ew jî, nediyarkirina navê hozanên ku klam û stran gotine ne. Navên berhemên hene, lê navê kesên ku ew strane neniw-sandine.

Ji cîhana muzîka Kurdî



Ehmedo Ronî



Koma WETAN

Mînak Şemê Rebenê û Hesên Bîra Rabe, bi sentezeke xweş hatine çêkirin.

Koma Wetan ji van kesan pêk tê: Keyaramê Taarê Ger-danzêrî, Omarê Sebriyê Racevî, Rafael Şamilê Dasenî, Lev Şahbazyan. Ev qaset jî, di nav berhemên Stran Mûzîk Üre-timê de derketiye.

Mûsîqa Kurdî ya modern

Koma Wetan komek Kurdên Ermenîstanê ye. Li gorî agahiyên di bergên qasetê de, ev xebateke komê ya sala 1980'yî ye.

Xebat, xebateke biyan e di warê muzîka Kurdî de. Muzîk bi awayekî Pop, Caz û Rockê hatiye çêkirin. Amûr û aletên ku hatine bi-karanîn gişt biyan in.

Bingeha muzîka komê, ji aliyê teşeya parçeyan û bi-karanîna melodiyan ve, ji muzîka Kurdî dûr be jî, di hin parçeyan de nexşên muzîka Kurdî xwe bi awa-yekî serbilind dide xuyan.

Seredana General Aydin Îlter ji bo başûrê Kurdistanê, reşbayên nû bi xwe re tîne

Di navbera xewn û rastiye de başûrê Kurdistanê

Kerîm Rewandîzî


Hewlêr- Ji hemû kesan re ron û diyar e, gelê me yê başûrê Kurdistanê di rewşeke pîrr xerab de diji. Li derveyî vê yekê, rewşa siyasî jî nexuyaye bê bi ku ve dihere.

Werzê havînê bêberhem derbas dibe, rengê zivistanê pîrr mişextî û giraniya xwe derdixîne qadê. Dihat xwestin ku, îsal hikûmeta herêmê zende (fîbret) ji sala par derxistibe. Diviyabû ku, pîrsgirêkên gel ên aborî û civakî çareser bikin. Ji bo ku, çavên wan li destê neyaran nebe. Îsal alîkariya biyaniyan ji bo başûrê Kurdistanê bi tu awayî nayê ber çavan. Divê her bawerî ji wan neyê kirin. Lê bazirganên jehrê dixwazin ji rewşê sûdê bibînin.

Ji aliyê din ve seredanên heyetên biyanî li başûr jî her berdewam in. Generalê dewleta Tirk Aydin Îlter tevî komek general û efseran, di roja 1.9.1993'yan de seredanekê li Başûr pêk anî. Armanca hate diyarkirin ku çareserkirina rewşa aborî ya başûrê Kurdistanê ye. Ev kes jî aliyê hinek serekên partiyên ve bi awayekî germîn hate pergandin (pêşwazîkirin).

Ronahîkirina vê seredanê ji aliyê navendên ragihandinê yên Başûr ve wiha hate daxuyandin: "General Aydin Îlter ji


● Armanca generalê Tirk her xuyaye û ne pêwîst e bê veşartin. Daxwaza wan ew e ku, li ser sînor, ango parastina sînor, peyman bi hikumeta herêmê re bêne çekirin. Di gel vê ev operasyon dê di şeweyeke ekonomîk de bê pêkanîn. Yanê, dê li devera Botan-Behdînan ji bo ku operasyon li dijî PKK'ê bêne kirin, her wiha ji dewleta Tirk tê xwestin ku ew jî pere bide.



Mesut Berzani



Aydin Ilter



Celal Telabani

bo çareserkirina aboriya Başûr seredanî vê derê kiriye". Li gel vê, ev nakokî di navbera ragihandinên PDK û YNK'ê de derdikeve ku her yek wan jî aliyekê ve lêkolînê dikin.

Ragihandina PDK'ê vê seredanê bi dozên aborî û siyasî ve dide xuyan. Li gorî ya YNK'ê jî, ev seredan, "Ji bo doza parastina sînor pêk hatiyê."

Divê bê diyarkirin ku, Mesud Berzani û Celal Telabani bi hev re çûn pêşiya General Aydin Îlter û pê re rûniştin. Lê ev rewş jî aliyê navenda ragihandinên wan ve nehate daxuyandin.

Gelo dewleta Tirk bi vê rewşa xwe ya ketî dikare çi alîkariya aborî bi başûrê Kurdistanê re bike? Tu kes nikare bawer bike ku dewleta Tirk carekê ji caran nanekî şewitî,

bê-berdêl avêtibe ber pişke-ke kor jî.

Çawa dibe, generalê ku li Bakur fermana kuştina Kurdan dide, were hawara helkirina gelşên başûrê Kurdistanê? Bi tenê di mejiyên wan kesên ku qereqol, kontra, cenderme, top, tanq, bafêr û hwd. hebe, dê di lîteratura wan de jî şewitandin û qirkirin hebin.

Armanca generalê Tirk her

xuyaye û ne pêwîst e bê veşartin. Daxwaza wan ew e ku, li ser sînor, ango parastina sînor, peyman bi hikumeta herêmê re bêne çekirin. Di gel vê ev operasyon dê di şeweyeke ekonomîk de bê pêkanîn. Yanê, dê li devera Botan-Behdînan ji bo ku operasyon li dijî PKK'ê bêne kirin, her wiha ji dewleta Tirk tê xwestin ku ew jî pere bide.

Wisa dixuye ku, di çenteyê general de peyameke (mesaj) din jî hebe. Ew jî nêzîkkirina hin serekên partiyên ber bi Sedam ve ye. Lewre Çiller dixwaze alîkariya rejîma Sedam bike, wî jî tengasiyê derxîne. Serokwezîra Tirkiyeyê Tansu Çiller dixwaze vê yekê bi Neteweyên Yekbûyî jî bide pejirandin. Di wan rojan de Sedam baştir li piştî Tirkan e. Ku Çiller karibe navbera Kurdan û Sedam xweş bike, dê karibe rola xwe bilîze.

Di vê seredana generalê Tirk de, armancake din jî avakirina artêşeke taybetî ye.. Her çendî ku di navenda ragihandina hikûmeta herêmê de nehatibe xuyakirin jî. Hikûmeta Çiller jî bo avakirina vê artêşê serî li Îsraîl jî dabû. Her wisa, lêzanên Sedam jî seredanî Tirkan kirin.

Li başûrê Kurdistanê lîstikên xeternak li ser gelê me tînen leystin. Ev rewş bi her awayî û jî her hêlî ve tê ditin.


XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Endamê Komîteya Navendî yê Yekîtiya Dîndarên Kurdistanê. Çend hefte berê, li Mûşê, bi destê kontrogerîla hate kuştin. Di wêne de tê, dîtin 2-Sebir/ Giyayek/ Xwarineke bingehîn, ji genim çêdibe 3-Hejmarek/ Celebek boyaxa wêne çekirinê 4-Bi Îngilîzî huner/ Ufq 5-Perr / Cînavkeke yekhejmar ji bo kesên sêyemîn/ Hacet, amûr 6-Cînavkeke îşarkî ji bo kesên sêyemîn ku nêr û li nêzîk be 7-Di hinek devokan de agir/ Pizot 8-Tav/ Adet, kevneşop 9-Danekî ji rojê/ Nexweşînek 10-Li Rojhilata Navîn navê dewletekê/ Bi Îngilîzî 'na'

Serejêr: 1-Berhemeke ku ji şîr çêdibe/ Navekî jinan/ Belê/ Sewaleke fitnebaz 3-Notayek/ Roj/ Bîndest, reben 4-Cînavka kesane pîrrehejmar ya desta yekemîn/ Nebatek ku bi bêhna xwe navdar e, ji cîsnê pîvazê ye/ Ji Misra qedîm navê îlahekê 5-Baş, qenc 6-Bi Dimilkî bihar/ Tûjik 7-Pispor, jîr, zana/ Frêze, qarot (ji bo genim) 8-Mane 9-Bi Erebbî 'ez' 10-Şêlandin, bi darê zorê valakirin, xerakirin 11-Navê rojêkê/ Cihê ku tav

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



na bîne 12-Madenêk
BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1-Pablo Nerûda 2-Ade/ La/ Edilî 3-Rade/ Noş/ Kar 4-Arizî/ Rave 5-Rasteqîn 6-Tax/ Aa 7-Iraq/ Wad 8-Nînova 9-Zanîn 10-Lenîn
Serejêr: 1-Parastin 2-Adar/ Arîle 3-Bedirxan 4-Eza/ Qozî 5-Ol/ İsa/ Van 6-Nan/ Tawan 7-Opera/ İn 8-Reş/ Qedene 9-Ûd/ Rî 10-Dikan 11-Alav 12-Îrem

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkiyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas

Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

TOZTOZ AXA

Li Kurdistanê, li ber çemekî aşek û li ber wî aşî jî qeraşek (aşvanek) hebû ye. Qeraş tim di nava ard û ardivan de, rî û simbêl jê dirêj bûn e. Her çiqas ne pîr be jî rî, û simbêl di nav ard de spî bûne.

Qeraş rojekê dibîne ku, roviyek di ber êş de diçe tê. Bang lê dike: "Birikê rovi te xêr e, çi li serê te qewimiye? Were em bikin gale gal." Rovi tê, silavê dide, rûdine û dibêje: "Ez şivanê wî gundê han bûn, ez qewitandim (berî min dan). Lewma ez ji xwe re li stargehekê digerim."

Aşvan: "Heke derdê te ewqas be xem neke. Were li nik min be, yek caran paqijiya van deran bike, bes e."

Rovi bi vê yekê gelek dilgeş dibe li wir niştê dibe. Çend roj bi vî awayî derbas dibin, rojekê rovi dibêje: "Kekê, tu zewiciyî an aziw (ezeb) î?"

Qeraş dibersivîne: "Ez benî ma tu halê min dibînî, kî bi vî halî keça xwe bide min." Li ser vê yeke rovi dibêje: "Heke tu bixwazî em karin ji te re keça paşa bînin."

Qeraş matmayî dibe û bi awirekî tûj dibêje: "De here lo, tinazên xwe bi min neke. Kîjan paşa keça xwe dide min." Rovi bi awayekî bi xwe bawer dibêje: "Wele keko na, ez



tinazên xwe bi te nakim û ez ne dînim jî. Bes tu bibêje herê, têkîlî tiştêkî dinê nebe."

Qeraş bi dilekî sar û nebawer dibêje: "Fermo, min rê daye de biçê."

Jixwe, rovi li benda tiştêkî wisa bûye, bi lez û bez berê xwe dide qesra paşa. Diçe li ber deriyê qesrê radiweste. Tizbiyek 33 heb di dest de, kumik li serî ye. Pavan (nobedar) jê dipirsin: "Te xêr e xalê rovi, çi dixwazî?"

Rovi bi qurefî dibêje ku, karekî wî li cem paşa heye. Berdidin diçe hundir. paşa di civînê de ye, rovi li ber dêrî diçe, tê. Civîn belav dibe, rovi dikeve hundirê menzelê. Li diwanê li aliyê jorin rûdine. Paşa dibêje: "Bi xêr hatî

rovîyê hêja, derdê te çi ye?" Rovi dibêje: "Ez ji bo karekî bi xêr hatim. Ez keça te ji bo lawê Tozaxa, mîrê me Toztoxaxa dixwazim." Paşa dibêje: "Heke Xwedê kiribe dibe. Lê divê ez hinekî mîrê we nas bikim. Ez Tozaxa bidim pirsîn kî kiye, ji kê ye? Ez dê piştî çend rojan çend (qasidan) siwariyên xwe bişînim. Ji gel bipirsîn, piştî vekolinê ez dê bersivêkê bidim te." Rovi bi dilekî geş xatir dixwaze û dikeve rê. Bi rê ve ku rastî kê tê dibêje: "Heke mirovên paşa ji we pirsîn, gotin ew malê kê ye bibêjin yê Toztoxaxayê kurê Tozaxa ye."

Piştî çend rojan vê carê qasidên paşa dikevin riya ku rovi şopand, dipirsin.

Ku rastî kê tên, dibêjin: "Ew malê kê ye?" Dibêjin: "Ën kurê Tozaxayê, Toztoxaxa ye". Ew matmayî dimînin û bi şûn ve vedigerin tên ba paşa, dibêjin: "Fermendarê me, ew kes mirovekî gelek dewlemend e. Ji vir heta gundê wî me ji kê pirsî got: "Ev gund, mal, pez, zevî yên kê ne gotin yê kurê Tozaxa mirê me Toztoxaxa ne." Rovi tê malê, qeraş dibe li qeraxa çemekî dihêle û dibêje: "Min planek heye, tu li vir be, ez tîm."

Tê gund dike qîrîn û hawar dibêje: "Gundîno, xayîno axayê me Toztoxaxa diz û ebaboz hatine peşiyê, ew şêlandine. Li ber çem rî lê dirêj bûne, cilên wî (kinc) perîfîne,

we hay jê nîn e." Berberan, terziyan hildide diçe, riyên qeraş kurr dikin, timtêlên xweşik lê dikin û fînin.

Rovi mîrê xwe li hespekî kihêl siwar dike, dibe qesra paşa. paşa rûmetê ke mezin dide wan, piştî bersivê erênî, dîlan dest pê dike. Dîlan çil roj û çil şev dom dike.

Roja çil û yekan, karwanê dîlanê bi rê dikeve, ber bi qaşo Qesra Tozaxa ve. Rovi ji pêş de, bi lez û bez tê, hinek giya li ser hev lod dike, agir pê dixê û agir berî êş jî dide û tê. Bi hawar û girîn dibêje: "Mîrê min, gundiyan xayîno qesra te şewitandine, malê te, zewiyên te li hev par kirine."

Dema padişah vê yeke seh dike, komek leşker dişine ser gundiyan. Gelekan ji van dide kuştin, dest dide ser malê wan û hemiyan dide zavayê xwe. Ji wî re qesrekê ava dike, tê de bi cih dike û dizivire.

Çend roj bi kêfxweşî derbas dikin, bûk û zava ji rovi aciz dibin. Pihînekê li qûna rovi didin û wî diavêjin derve. Ji ber ku bi destê paşa li gundiyan zilm dabû kirin, kes wî nake nav xwe û ew tenê bêheval û bêmedal dimire.

Berhevkar:
Cewdet Kûşman


Mamik

Haydê zarokino tev bi hev re bihizirin ka bê di mamikên jêr de çi tînin pirsîn.

- 1- Gundorko heft qulorko.
- 2- Kudirê daleqandî, çavê lê beliqandî.
- 3- Tenûrek himhimî tije nanê genimî.
- 4- Şkeftêk reş tije nêriyê beş.
- 5- Şîrîno li darîno, darîno kerîno guh belo, ne mişk e spî wek nivîşk e.
- 6- Glover in ne rast in, not û neh in ne sed in.
- 7- Text e ne dar e, kerre ye ne mar e, çiloxwar e ne kar e.
- 8- Tasek mast li guhereke rast.
- 9- Lem lemo li ber çemo ne gur dixwe ne diz dibe.
- 10- Bi şev bûk e, bi roj pepûk e.
- 11- Bi roj cêriye bi şev xatûn e.

Berhevkar: Salîh Günbat

Bersiv: 1- Serê mirov 2- Singa heywanan 3- Gûz 4- Dev û dran. 5- Seytanok. 6- Tizbi. 7- Kûstî. 8- Hiv. 9- Aş. 10- Lampe. 11- Meknes (Sezik. Sivnik)



Serîhildaneke mezin di nav çavên împeryalîzmê de

Salar Amedî

Frankfurt- Ev cara sêyemîn e ku, Kurd li Ewropayê di nav çavên împeryalîzmê de, bi deh hezaran-sedhezaran digihêjin hev û dengê xwe bi ser dinyayê ve dixin. Ewropayê dihejînin û dibin tirs û xofa dilê dijmin û hemû împeryalîzmê.

Ji ber vê yekê jî, bi taybetî dewleta Almanya, tevî hemû dewletên Ewropayê ve, ji bo ku bi dehezaran Kurd negihêjin hev û xewên şevan li wan neherimînin gelek astengî di Festivala Navneteweyî ya Kurdistanê de derxistin. Di serî de, dewleta Alman, di kirêkirina stadyumê de gelek astengiyên burokratî û hwd. derxistin. Hevalên ku festivalê organîze dikirin, diçûn kîjan stadyumî bazar dikirin, ji bo ku nikaribin kirê bikin, kiriya stadyumê deh be, sed dixwestin.

ASTENGIYÊN LI DÎJÎ FESTİVALE

Diviyabû ku, festival di meha Tebaxê de pêk were, lê ji ber van astengiyên inçax bi gelek zehmetiyên di 4'ê Îlonê de pêk hat.

Astengî bi van jî neqediyan. Piştî ku stadyum hate kirêkirin û mējûya festivalê tesbît bû, Kurdên ku ji welatên din ji bo vîzeyê çûn balyozxaneyên Almanyayê, dest vala vegeyriyan. Lewre Almanya yê vîze nedida Kurdan. Ji kesên ku vîze dixwestin re, bi awayekî vekirî digotin: "Emir ji Bonê hatiye ji me re ku, em heta dawîya festivalê vîze nedine Kurdan. Piştî festivalê werin, hûn çiqas bixwazin emê vîze bidine we." Hevalên ku berê vîze standibûn jî, dema ku çûn pasaportên xwe ji balyozxaneyê bistînin, li ber çavên wan mora îptalkirinê li ser vîzeyên wan xistin û gotin: "Em ji bo hûn neçin festivalî wiha dikin." Dewletên din jî dema otobus dihatin ber sînor ku derbasî Almanyayê bibin, tevî ku vîzeyên wan hebûn jî, astengiyên mezin derxistin pêşîya wan.

Fransa 35 otobus ji sînor derbas nekir. Li ser vê yekê 2 hezar kesên di otobusan de ne, pêşî ji bo protestokirinê demekê rûdinin û dû re jî nêzikî 20 km'yî dimeşin. Çapemenî û televîzyon giştî tîhê bûyerê. Li ser vê yekê, dewleta Fransayê mecbûr dimîne û deriyên vedike. Piştî destpêkirina programê, bi 2 saetî ev welatparêz gihîştin cihê festivalê. En ku berê hatibûn û di stadyumê de cihê

Stadyum seranser bi wêneyên Serok Apo, ên şehîdan û bi alên PKK, ERNK û ARGK'ê ve hatibûn xemilandin. Lê berpirsiyarên stadyumê tîhê û dixwazin ku hemû al û wêneyan bidin rakirin. Ji bo ku problem zêde nebe, hevalên wezîfedar hinek wêneyên al û cihên wan radikin. Lê dîsa jî, nivê stadyumê bi wêneyên Serok û bi 2 alên ERNK'ê xemilîbû. Her wiha der dorê stadyumê jî xemilandi bûn.



xwe girtibûn, bi dirûşmê û bi lîlandinê bixêrhatina welatparêzên ku ji Fransayê dihatin kirin.

Stadyum seranser bi wêneyên Serok, ên şehîdan û bi alên PKK, ERNK û ARGK'ê ve hatibûn xemilandin. Lê berpirsiyarên stadyumê tîhê û dixwazin ku hemû al û wêneyan bidin rakirin. Ji

bo ku problem zêde nebe, hevalên wezîfedar hinek wêneyên al û cihên wan radikin. Lê dîsa jî, nivê stadyumê bi wêneyên Serok û bi 2 alên ERNK'ê xemilîbû. Her wiha der dorê stadyumê jî xemilandi bûn.

Dewletên împeryalîst ji bo îptalkirin an jî provekirina festivalê gelek hewl dane xwe.

Lê nikaribûn bibin asteng ji 100 hezar kesî re ku, bi yek dilek, bi yek canek û bi yek baweriyek gihîştibûne hev û din.

Festival, ji aliyê organîzekerîne ve hema hema bêkêmasî bû. Xuyabû ku mesrefeke gelek mezin hatiye kirin. Bi hezaran wezîfedar di vê organîzasyonê de cihê xwe girtibûn.

Platformeke mezin li meydana stadyumê hatibû çekirin. Ekranekê mezin hebû. Programên festivalê raste rast didane vê ekranê. Carina kamerayê dida ser wêneyên Serok an jî şehîdan, wê demê bi dirûşmeyan stadyum dihejiya.

DURÛTIYA ALMANYAYÊ

Ji bo pîrozkirina festivalê gelek mesaj hatin. Serokê Koma Mafên Mirovan ê Îngilîstanê Lord Avebury, hin parlamenter û kesên heja jî bi xwe hatibûn, mesajên xwe bi xwe xwendin. Di nav mesajên de yê herî balkêş, ên Qralê Îspanya Juan Carlos, Serokwezîrê Swed Karl Bild û Serokwezîrê Almanya Helmut Kohl bûn. Ji mesaja Kohl durûtî dibariya. Ji aliyekê ve, ji bo rêlibergirtina festivalê her tiştî dike, ji aliyê din ve jî bi mesajekê festivalê pîroz dike.

Bi vê festivalê, dilê me di nava me de, deh carî li xwe mezin bû û serê me heya asîman bilind bû. Di şahiyekê wiha de, şehîdkirina parlamenterê DEP'ê Mehmet Sincar û Endamê Komîteya Karkeriya DEP'a Batmanê Metin Özdemir hate anonskirin. Pê re jî, stadyum bi sloganên "Şehîd nemir in", "Bijî Serok Apo" jî himê xwe ve lerizî. Bi hindikahî 10 deqîqe 100 hezar kes li ser lingan rawestiyên û bajarê Frankfurtê bi dirûşmeyên xwe hejandin.

SURPRÎZA FESTİVALE

Di dawîya programê de, surprîzekê kirin û mesaja Serok ji dengê wî dan operloran. Bi bawerîya min, mesaja Serok zûtir bidana, dê çêtir bûna. Ji ber ku gelek kesên ji riyên dîr hatibûn, zû ji stadyumê derketibûn.

Di vê festivalê de weke gelek şahiyên me, me xweşî û nexweşiyên bi hev re derbas kirin. Piştî festivalê otobusek ku ji Berlînê hatibû, li ser rîya vegeerê qeza derbas kir û 4 welatparêz mirin, 8 jê giran 50 kes jî birîndar bûn.

Programa festivalê seranser bi profesyonelî hatibû amadekirin. Festivala Navneteweyî ya Kurdistanê, bû serbilindahiya gelê Kurd û rûşeya împeryalîzmê. Dema mirov li cihêkî mîna Ewropayê ku, mirovahiyê dadîqurtîne û tune dike, çav bi ev çend Kurdî dikeve, wê demê mezinahî û bilindahiya ked, xwîn û xwedana ku ji bo amadekirina van rojan hatine rijandin û kirin, edî çêtir dibîne.

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.